



Hêza HADEP'ê MKGK tirsand

R. 3

Hevpeyvîn li gel R. Haddeler:

Her çand li ser koka
xwe şîn dibe

R. 89

Ahmet Huseyn:

Siyaseta Brîtanya ya li ser
Kurdistanê


R. 45

Hayrettin Çelik:

"Kenê te
azadiya min e"

R. 6

Azadiya **WELAT**



SAMI TAN

Digel vê yekê, hemû hewl-
danên hilweşandina rejî-
ma Saddam tîk çûn û
Piştî ku di 1996'an de
Barzanî hêzên Saddam
vexwendin başûrê
Kurdistanê ji qadê hêzên
bejî yên Amerîkayê
vekişyan.

Krîza kendavê û kurd

Li cîhanê bûyerên girîng diqewimin. Cîhan giş rabûye ser piyan, gişan bala xwe daye qêrana di navbera Iraq û Amerîkayê de. Her şev di televîzyonên tirkan de dîmenên şer hene, li aliyekî di dîmenên moşek û balafiran li aliyê din zar û zêçên ku li hol û meydanan tiving girtine destê xwe û digel dirûşmeyên ku pesnê Saddam didin, perwerdehiya leşkerî dibînin.

Li holê hinek hincetên diyar û hinekên veşarî hene; li gorî Amerîka yê di destê Iraqê çekên tevkujîya girseyî hene, lewre ew rê nade çavdêrên NY'ê ku lêkolînê bikin, ji ber vê yekê jî ew dixwazin dersekê bidin Saddam. Li aliyê din Iraq dide zanîn ku di destê wê de çekên tevkujîya girseyî nîn in. Her wisa jî din rayedarên Iraqê bi bîr dixin ku cihên ku çavdêr dixwazin bikevin, qesr û qonaxên Saddam, ew cih ji bo welatekî cihên pîroz in, divê nebin warê lêgerînê, tu gel rûmeta xwe nake bin piyan vê yekê napejirîne.

Lê sedemên ku nayên daxuyandin çi

ne? Amerîka naxwaze pergala ku wê daniye ji aliyê hêzekê ve bê belavkirin, qet nebe yek li hemberî wê serhişkiyê bike, lewre jî dixwaze bi êrîşeke li ser Iraqê hêza xwe bi dinyayê bide nîşan. Digel vê yekê, hemû hewldanên hilweşandina rejîma Saddam tîk çûn û piştî ku di 1996'an Barzanî hêzên Saddam vexwendin başûrê Kurdistanê ji qadê hêzên bejî yên Amerîkayê vekişyan. Însiyatîfa Amerîkayê li ser başûrê Kurdistanê kêmbû, demekê xwest bi riya artêşa tirk daxwazên xwe pêk bîne, lê ew yek li gorî dilê wê nîn e, lewre dewleta tirk li pey hinek armancên din e.

Li gorî agahiyan Amerîka dixwaze bi êrîşekê ve valahiyê bi destê xwe dagire, Saddam ji ser kar dûr bixe û kesekî ku li gorî dilê wê bîne ser kar. Digel vê yekê gelek senaryoyên li ser diwaroja Iraqê jî tene nivîsandin. Senaryoya ku dewleta tirk herî zêf ditirsîne, ya avakirina Kurdistaneke serbixwe ye.

Li hemberî vê yekê, rejîma Iraqê jî

dixwaze gelê xwe li hemberî Amerîkayê tûj bike, piştgiriya ji bo rejîmê zêdetir bike. Her wiha tê gotin ku Saddam dixwaze, maweyekê ji bo gemaroya li ser Iraqê bide diyarkirin.

Li aliyê din dewleta tirk jî li gorî karîna û zanîna xwe hinek planan saz dike, di nava vê planê de dewleteke tirkmenan heye. Di plana dewleta tirk de armanca sereke, di avê de birina hêvî û daxwazên gelê kurd e. Ji axaftinên rayedarên tirk tê fêmkirin ku ew otonomiya Başûrê jî ji bo xwe wekî xetere dibînin. Digel vê yekê hê jî hinek hêzên başûrî rastiyê nabînin û ji bin siya dewleta tirk dernakevin.

Kurdên azadixwaz jî, li gorî xwe planan digerin, li aliyekî helwesta antî-împeryalist li dijî şer nîşan didin, li aliyê din jî dixwazin ji guherîna statûkoyê sûdeke baş wergirin.

Xwendevanên heja ji ber egerên li ber çavan, buhayê rojnameyê bû 150 hezar.

Kurd û çapemenî

Ferhengok

ROŞAN LEZGÎN

Niha, em mirovekî/ê bînin ber çavên xwe ku ker û lal e. Jixwe, kesên ker û lal ji ber ku nikarin tîkiliyeye sererast bi der û dora xwe re deynin, dinya wan jî teng e. Ev kesên ker û lal tu dixwazî bila hêza wan gelek be jî, careke din nikarin wê hêza xwe jixwe bi awayekî tekûz bixebitînin.

Neteweyeke bê çapemenî jî, dişibe kesên ker û lal û di ser de jî xwedî dinyayeke teng e.

Çapemenî, ji bo neteweyekê çav, guh, ziman û mejiyekî hemdem e. Gelo, rewşa gelê kurd û çapemeniya wî çawa ye?

Îsal em 'Sedsaliya Rojnamegeriya Kurdî' pîroz dikin. Ev sedsal e ku kurdan dest bi rojnamegeriyê kiriye. Lê, mixabin em ji bo rewşa çapemeniya kurdî 'bi taybetî ji bo rojnamegeriya bi zimanê kurdî' nikarin tiştên zêde berbiçav û pêşveçûyî bînin zimên. Sedema yekemîn; Ger em gelê xwe û civakên pêşveçûyî rûber (muqayese) bikin; ev yek wê xwe bide der. Sedema, duyemîn jî; niha di van salên dawî de bi saya xwîn û xwêdanê li ge-

lek waran de pêşveçûnên berbiçav çêbûne. Lê, li gorî van pêşveçûnan çapemeniya bi zimanê kurdî qels û lawaz maye.

a) Sedema herî mezin ew e ku, em hîn başbaş qedr û qîmeta çapemeniyê nizanin.

b) Têkiliyên çapemeniya kurdî yên bi gel re û bi saziyên neteweyî yên din re hîn gelek kêmtin.

Di vê sedsaliya rojnamegeriya kurdî de, divê em seferberiyeye giştî ji bo xwendin, nivîsandin û axaftina bi zimanê kurdî li dar bixin.

c) Ji ber ku di nava ziman û rojnamegeriya kurdî de pêwendiyeye diyalektîk heye; gelê me jî hîn di warê xwendin û nivîsandina bi zimanê xwe de gelek li paş e.

d) Çapemeniya kurdî, hîn di qonaxeke amatorî de ye. Nivîskar û rojnamevanên me bi piranî karên xwe bi amatorî dimeşînin û hîn di çarlepê de ne.

Çapemeniya kurdî, ji bo geşedaneke xurt û pêşveçûneke li gorî demê pêk bîne, divê xwe raste

rast biavêje hembêza gelê xwe yê dilfireh. Wê ev gelê han çapemeniya xwe jî wekî zarokeke li ber şîr, bikemilîne û bigihîne qonaxeke hemdem.

Divê rojnamegerên kurdî di her fersendê de xwe bigihînin gel, qedr û qîmeta çapemeniya kurdî a di warê yekîtiya neteweyî, pêşvebirina ziman, çand huner... de bi gel başbaş bidin zanîn.

Di vê sedsaliya rojnamegeriya kurdî de, divê em seferberiyeye giştî ji bo xwendin, nivîsandin û axaftina bi zimanê kurdî li dar bixin. Di vê çarçoveyê de kampanyayên xwedîlêderketin û pêşvebirina çapemeniya kurdî pêwîst in. Nivîskar, rewşenbîr û rojnamevanên me hewce ye di çarçoveya vê seferberiyê de konferans û semîneran li dar bixin û derbarê van mijaran de gotaran (makale) ji bo weşanên me yên ku bi zimanê tirkî jî çap dibin, binivîsin. Rojnamevan û zimanzanên me bi xebateke kollektîf, broşûran metoda xwendin û nivîsandina zimanê kurdî ya herî hêsan û pratîk amade bikin û li saziyên wekî HADEP'ê û li nav gel belav bikin.

asêkirin: dadan, girtin
alozî: anarşî, kaos
barûdor: rewş, weziyet
bergirî: tevdir (önlem)
bêhempa: Yekta
bilêvkirin: telafûzkirin
çewsandin: zordarî, pest û kotekî
çêlîkirin: behskirin, dabaşkirin
çihansûmul: gerdûnî
dabeşkirin: parvekirin, paykirin
deng: ray
destkarî: mûdaxele
dêhn: bal, serinc
eger: sedem, hoy
ekl: çêj, tam
êsta: nika, niha
hincet: ûşt, mazeret
hindîkahî: kêmtetewe
hino hino: hêdî hêdî
hesdîn: dexezî, çavnebarîkirin
hevkeşe: mêzîn(denge)
karfiger: bandor, tesîr
kat: dem, wext
kirêt: qirêj, qilêr
kiryar nediyar: fail-î meçhûl
konevanî: ramiyarî, siyasi
kujer: mêrkuj, qetîl
kutakirin: qedandin,

tewawkirin
qanûna bingehîn: destûra bingehîn (anayasa)
mafdar: biheq
pesendkirin: tasdîk kirin
pend: şîret, taswiye
peyxam: peyam, mesaj
pêjinkar: hessas
pêpeskirin: îhlalkirin
raçavkirin: kontrolkirin
rêkûpêk: întizam
rêzname: nizamnema
rojnivîsk: guncê, günlük
sazker: organîzator
serinc rakîşandin: balkişandin
sergerd: serheng (binbaşî)
talî: dawî
temen: emr, jî
tengjîn: zivêrbûn, acizbûn
trimpel: otomobîl
vehesîn: bêhvedan
xal: made, noqte
xedar: bi şidet
xeternak: tirsnak
xwerisîf: xwezayî, siruştî, tebî
zanyarî: agahî
zivêr: aciz
zêmar: aşt

Hêza HADEP'ê MGK tirsand

Tê gotin ku heke RP asê bibe, wê HADEP di hilbijartinan de nêzikî %10-12 rey bistîne û nêzikî 60-70 mebûsî derxîne. Li gorî xwediye vê baweriyê heke ev yek pêk were, dê hevkeşeya rêjîmê serobino bibe. Ev nêrîn, êrîşên ku niha bi ser HADEPê de dibin bi awayekî zelal dide nîşan.

Rojnameya Türkiye beriya ku dewlet bi ser HADEP'ê de bigire îxbara xwe kir û di îxbara xwe de daxuyaniyên seroka DYP'ê Tansu Çillerê derxistê manşetê. Di manşeta rojnameyê de bi sernavê 'HADEP sancîsî (Taya HADEP'ê)', dihat gotin ku piştî girtina RP'ê dê li Kurdistanê dengê HADEPê zêde bibin. Dîsa dihat xwestin ku ji niha ve bergiriyê vê yekê bê standin. Her wiha tê gotin ku heke RP asê bibe, wê HADEP di hilbijartinan de nêzikî %10-12 rey bistîne û nêzikî 60-70 mebûsî derxîne. Li gorî xwediye vê baweriyê heke ew yek pêk were, dê hevkeşeya rêjîmê serobino bibe. Ev nêrîn, êrîşên ku niha bi ser HADEPê de dibin bi her awayekî zelal dide nîşan. Lewre hêzên dewletê di 12.02.1998'an de biryarên MGK'ê yê 28'ê reşemiyê bi cih anîn bi ser HADEPê de girtin. Bi vê êrîşê tevî Serokê Giştî yê HADEP'ê Murat Bozlak û 6 rayedarên din hatin binçavkirin û piştî ku çar rojan dibin çavdêr man bi biryara serdozgerê DGM ya Enqereyê Talat Şalk hatin girtin û niha jî di Girtigeha Sergirtî ya Enqereyê de ne.

28'ê reşemiyê biryarên ku ji aliyê MGK'ê ve hatibûn girtin piştî RP'yê di rêzê de HADEP hebû. Hêzên dewletê bi hincetên bêbingeh êrîş anîn ser partiyê, li ber wan kirinan çapemeniya tirk dîsa bêdeng ma. Hinek rewşenbîr û rojnamegerên tirk ên ku wekî demokrat tene nasîn li ser HADEP'ê dev ji doza demokratbûnê jî berdan Di nav wan de bi tenê Can Dündar, Yavuz Gökmen, Yalçın Doğan û Mehmet Altan cih dan vê mijarê.

Yavuz Gökmen di nivîsa xwe de wiha dibêje: "Mesela partiyekê siyasî digirin, ji ber ku nikarin kontrol bikin. Hestê bêhêzbûnê bi girtina partiyên encam dide. Piştî wê heger ve be em ê dîsa bigirin dibêjin. Eger giregirên me hin tiştan asê bikin bizanibin ku ji wî tiştî ditirsîn. Ji ber ku ew hêza wan nîn e ku wî tiştî kontrol bikin. Li derve kes li wan guhdarî nake û tu kes agahiyên nade wan. Lewre ew jî vê hêsa xwe ji serê yê li nav xwe de derdixin. Li ser hev partiyên asê dikin. Ji bo ku HADEP'ê asê bikin hemû rêveberên wê dixin girtigehan. Ew tê nagihên ku girtina Leyla Zana û hevalên wê û asêkirina tiştên ku nikarin kontrol bikin, têkbirina dewleta demokratîk e. Piçêkî jî prestîja Tirkiyeyê nemaye."

Nivîskarê Rojnameya Yeni Yüzyıl Can Dündar roja 15'ê reşemiyê li ser êrîşên navborî rawestiya. Li gorî baweriyê

riya Dündar derdorên şerxwaz nahêlin ku kêşeyên heyfî bi riyên demokratîk û aştîyane bî çareserkin. Her wiha Can Dündar îdia dike ku êrîşên li ser partiyên wekî DEP û HADEP'ê rê li ber PKK'ê vedikin û bandora wê li ser gelê kurd zêdetir dikin.

Nivîskarê Milliyetê Yalçın Doğan jî li ser dupûvaniya (çifte standart) qanûna cezayê radiweste. Di nivîsê de piştî ku li ser bûyerê û egerên wê hinek şîrove hatin kirin, tê gotin ku kesên rastgir dema çete ava bikin, xala 313'yan doz li wan tê vekirin û cezayê wê 5 sal in, kesên çepgir jî ji xala 168'an tî darizandin û cezayê wê jî 15 sal e. Doğan, li vir rewşa HADEP'îyan û çeteyên Susurlukê di de ber hev û bi vî awayî jî balê dikişîne ser neheqiyekê. Lê Yalçın Doğan, mirov nizane ji ber çî egerê, xwe mecbûr dibîne ku bibêje: "Ez tu tîkiliyên min bi bîr û ramanên HADEP'îyan nîn e."


Li aliyê din nivîskarê rojnameya Sabahê Mehmet Altan, di quncikê xwe yê roja 19'ê reşemiyê 1998'an li ser HADEP û RP'ê hin xalên balkêş anîn rojevê. Mehmet Altan di nivîsa xwe de diyar dike ku "endîşeya dewleta kurd" bû sedema girtina rêveberên HADEP'ê. Her wiha Altan di berde wama nivîsa xwe de dibêje: "Bi girtina RP'ê xwestin ku misilmanan bi sistemê ve girê bidin, niha jî heman tişt tê serê HADEP'ê."

HADEP ji bo çareseriyê kêşeya kurd mifte ye

Nivîskarê Rojnameya Cumhuriyetê Oral Çalışlar li ser bédengiya çapemeniyê jî bo Azadiya Welat daxuyand ku, çapemeniya li Tirkiyeyê, di warê demokrasî û mafên mirovan de ne pêjinkar e, ew li gorî politikayên navendî weşanên xwe dikin. Ji aliyê din ve Çalışlar diyar dike ku kêşeya kurd li Tirkiyeyê kêşeyekê zor dijwar e. Der barê vê kêşeyê de li dijî nêrîna giştî agahî dayin bi xetere ye.

Pişt re jî wî wiha got: "Li Tirkiyeyê înfazên bêdarizandin, failî meçhûl hene, zordestiya li dijî derbirina ramanên jî didome. Kêşeya kurd ku di nav kêşeyan de ya herî şerdest e, ji bo çareseriyê hê tu gav nehatîne avêtin. Piştî van gotinên mirov nikare bibêje ku wê sala 1998'an bibe sala demokrasîyê."

Oral Çalışlar di dawiyê axaftina xwe de bal kişand ser xalên girîng û wiha got: "HADEP partiyekê siyasî ye, Li Tirkiyeyê pêwîst e ku partiyên siyasî ramanên xwe bi awayekî azad bilêv bikin. Li aliyê din di warê çareserkirina kêşeya kurd de HADEP mifte ye. Heger tu vê



Oral Çalışlar

partiyê her dem biçewsînî, emê vê mesajê bigirin: Yê ku Tirkeyê yê bi rê ve dibin naxwazin ku kêşeya kurd bi şeweyekî aştîyane bê çareserkin."

Divê parçebûna welat jî bê nîqaş kirin

Nivîskarê Rojnameya Akît Yaşar Kaplan jî li ser êrîşên li dijî HADEP'ê nêrînen xwe ji me re vegotin. Kaplan di destpêka axaftina xwe de, diyar kir ku mafê me yê ku bi qanûna bingehîn hatine pesendkirin, divê jî aliyê dewletê ve neyên pêpeskirin. Nivîskarê îslamî, got ku ew bi taybetî jî êrîşên li ser serokên partiyên siyasî û nûnerên wan şermazar dikin. Kaplan diyar dike ku partiyên siyasî bi qanûna bingehîn hatine damezrandin. Lewre lazim e ku ev kes di bin temînata qanûna bingehîn de ramanên xwe vebibêjin.

Di berde wama axaftina xwe de Yaşar Kaplan got ku mirov, nikare kirinên li dijî HADEP û Refahê di platformeke huquqî de bi cih bike. Kaplan dibêje: "Pêwîst e ku partiyên siyasî bikaribin artêşê jî rexne bikin." Her wiha ew dide zanîn ku Pêwîst be divê ew karibin li ser parçebûna Tirkiyeyê jî biaxivin. Bi baweriyê Kaplan, divê bersiva ramanên ne şidet be. Di dawiyê axaftina xwe de Kaplan wiha dibêje: "Li Tirkiyeyê demokrasî ne jî bo her kesî ye, ew bi tenê jî bo hin kesan e. Eger li Tirkiyeyê problem di demokrasî û mafên mirovan de tunebûya kesî ew qas nîqaş nedikir. Ev yek jî nîşan dide ku li Tirkeyeyê ne demokrasî ne jî mafên mirovan heye."

AZAD ALTUN

Kurtenûçe

Nivîskarê rojnameya Yeni Yüzyılê Çoşkun Kırca, kurd wekî ahali (şênî) bi navkirin û rexne li kesên ku dibêjin kurd ber bi netewebûnê ve diçin, girtin. Kırca di nivîsa xwe ya ku roja 19'ê reşemiyê hate weşandin de, balê dikişîne ser zarava û devokên kurdî û dide zanîn ku mercên ku kurd tê de ne ji bo netewebûnê ne guncav in. Ew, kesên ku afgiriyê mafên kurdan dikin wiha heldisengine: "Ew kes bi nûçeyên derewîn dibêjin, dewlet zilmê li vê ahaliyê dike. Bi vê yekê dixwazin balê bikişînin ser xwe."

Serkirdeyatiya artêşa tirk, li ser xebatên diplomatîk yê Partiya Karkerên Kurdistan PKK ragihand ku, PKK di warê diplomatîk de xebatên xwe bi şeweyekî hûrbînî û tund didomîne. Serkirdeyatiya artêşa tirk, di gera ku ji bo nûnerên çapemeniya biyanî li darxist de, daxuyand ku PKK xebatên xwe yê diplomatîk bi 313 nivîsgehên (buro) navneteweyî dimeşîne. Bi pey van zanyariyan ji van nivîsgehan 178 li Elmanyayê ne. Di heman katê de Serkaniya Giştî ya artêşa tirk PKK wekî hem rêxistineke tewanbar û hem jî terorîst bilêv kir.

Nivîskar-Civaknas İsmail Beşikçi xelata Komelaya Mafên Mirovan a Spanyayê ya bi navê "Xelata ji bo Mafên Mirovan" hilnêrî. Beşikçi, di spasnameya xwe de ji bo helwesta her du rêxistinanan spasdariya xwe ragihand. Wî, serinc rakîsand ser terora Spanya û Fransayê û ji her du rêxistinanan xwast ku ew li dijî terora dewletên xwe rabin. Wekî tê zanîn İsmail Beşikçi, di Girtigeha Bursayê de ye û heta niha 100 sal cezayê hepsê û bêhtirî 10 milyar jî cezayê pera li ser wî heye û ev 20 sal e di girtigehê de ye.

Jina Serokk Komarê Komara Mahabadê Mina Qazî şeva roja 28 reşemiyê li Mahabadê jiyana xwe ji dest da. Mina Qazî di tîkoşîna kurdan a ji bo azadiyê her dem ji bo Mihemed Qazî bû piştigireke xurt û dilxwaz. Li ser mirina Mina Qazî Serokê Parlamantoya Kurdistanê a Li Derveyî Welat Yaşar Kaya û Serokê Lijneya Karkeriyê Zubeyir Aydar peyamên sersaxiyê belavkirin. Mine Qazî di sala 1908'an de ji dayika xwe bûye û di sala 1930'î de ji bi Qazî Mihemed re zewiciye.

Konferansa Qahîreyê û Siyaseta Brîtanya, ya li ser Kurdistanê

Brîtanya ji bo ku hêj siyaseteke xurt li ser Kurdistanê bide meşandin, Konferansa Qahîreyê li dar dixê. Di vê konferansê de serbaz û pisporên siyaseta Brîtanyayê; Rojhilata Navîn û he-ta yên Hindîstanê tê de cihê xwe digirin. Ev konferans di navbera 12-30 Adara 1921'ê de li paytexta Misirê tê lidarxistin.



Hêzên împeryalist di xwazîn başûrê Kurdistanê ji tevahiya Kurdistanê cuda bigirin.

Neyartiya dewletên împeryalist û bi taybetî jî ya Brîtanyayê li dijî gelê Kurdistanê ne tiştekî nû ye. Neyartiya Brîtanyayê digihêje ta sedsala 19'an. Lê bi şeweyekî şarezatir stratejiya wan piştî şerê cihanê yê yekemîn hat diyarkirin.

Di sala 1880'an de Şêx Ubeydullah ji Brîtanyayê alîkariyê dixwaze. Lê nûnerê konsolosxaneyê Brîtanyayê yê Wanê Efser Cloyton li cihê ku alîkariyê bike, dibêje: "Me garantî daye ku em dê yekbûna erdê Osmaniyan biparêzin." Her wiha hincetekê jî diyar dikin: Şêx Ubeydullah li dijî xiristiyaniyê ye. Ji bo vê jî planan çêdikin ku hinek tawîzan ji osmaniyan bistînin û hêza Şêx Ubeydullah belav bikin.

Bêguman ev gotinên Cloyton û tiştên ku li ser Şêx Ubeydullah hatine gotin ne rast in. Ji vê yekê bêhtir, ev rewş jî bo berjewendiyên wan ên bazirganî xeternak bû. Lewre jî alîkariya Şêx Ubeydullah nekirin. Ger hin caran hati-be xuyakirin ku Îngilîzan alîkariya hin tevgerên neteweyî kiriye, ev ji bo vê yekê ye ku dewleta Osmanî bi awayekî xurtir bi xwe ve girê bidin. Mîna alîkariya ku ji bo ermenî û suryaniyan hatiye dayîn. Jixwe Îngilîzan di wê pêvajoyê de, ji bo ku bazirganiya xwe li ser axa Mezopotamya, Kurdistanê û îranê bidomînin, hinekî alîkarî didan wan tevgerên ku me li jor dane xuyakirin. Yek jî ji bo ku bazirganên ermenî û suryanî ji bandora Rûsyaya Çar bi dûr bixin alîkariya wan derdoran dikir. Dîsa wekî tê zanîn,

di wê demê de armanca Îngilîzan li ser Rojhilata Navîn desthilatdar bûyîn bû. Ji ber vê yekê dixwastin rê li ber Rûsyaya Çar û dewletên din bigirin. Li ser vê bingehê Îngilîzan dewleta osmanî li ser piyan hişt û ew ji hilweşandinê parast.

Ger di dawîya sedsala 19'an de tevgerê Kurdistanê pêk bihata û geş bûya, rê li ber Rûsyayê vedibû da ku ew ji hêla Qafqasyayê de ber bi Anatoliyayê ve belav bibe. Çimkî serxwebûna Kurdistanê di wê demê de hilweşandina dewleta osmanî bi xwe re dianî. Ev jî, li gorî berjewendiyên rûsan pêwîst bû û li dijî berjewendiyên Brîtanyayê bû.

Dîsa piştî şerê cihanê yê yekemîn, di Rojhilata Navîn de aloziyek hate çêkirin. Dewleta Osmanî di şer de tîk çûbû. Yên ku bi ser ketibûn Îngilîz û fransî bûn. Van her du dewletên dagirker bi peymanan Syves-Picot (1917) Rojhilata Navîn di nava xwe de dabeş kir û bi hêzên mezîna Rojhilata Navîn ji nû ve dagir dikin. Ereba kirin 23 dewlet, piştî re jî Kurdistan kirin çar parçe.

Konevaniya ku bêhtir bandora xwe li ser Kurdistanê kir ya Brîtanyayê bû. Ji ber ku hem Şahê Îranê pê ve girêdayî bû û hem jî Iraq tevî başûrê Kurdistanê piştî raperîna 1920'an ketibû bin destê wan. Jixwe hemû raperînen ku li Başûr, Bakur û li Rojhilatê welêt rabûne, bi firokeyên Îngilîzan an jî bi alîkariya wan hatine perçiqandin. Stratejiya wan "parçe bike û bi rê ve bibe" bû. Wan, ev konevanî pir bi dijwarî li ser gelên Rojhilata Navîn û bi taybetî jî li ser Kurdistana

nê dida meşandin.

Konevaniya Brîtanyayê di destpêkê de di Peymana Sewrê de, wekî ku mafên pir mezin dane gelê kurd xwe dida xuya kirin. Ji ber ku Kurdistanê li dijî Rûsyayê bikin herêmeke tampon, qala mafên kurdan dikirin. Yanê, Sewr peymanan xapandina gelê Kurdistanê bû! Mixabin, tevî ku hêzên peyman li dar xistibûn bêhêvî bûn jî lê "serekên kurd" ev hêviya wan bi cih anî. Lê îro jî kesên ku hêviya xwe bi hêzên împeryalist ve girê didin, hene. Yanê ji xewa giran hêj hişyar nebûne.

Brîtanya ji bo ku hêj konevaniyek xurt li ser Kurdistanê bide meşandin. Konferansa Qahîreyê li dar dixê. Di vê konferansê de serbaz û pisporên siyaseta Brîtanyayê, Rojhilata Navîn û he-ta yên Hindîstanê tê de cihê xwe digirin. Ev konferans di navbera 12-30 Adara 1921'ê de li paytexta Misirê tê lidarxistin.

Di vê konferansê de siyaseta Brîtanya ew e ku; Kurdistanê bike parî parî û her pariyekî bi serê xwe daqurtîne. Yanê ji bo hûkmekî xurt li ser Kurdistanê perçekirin pêwîst didît. Çimkî di rojhilata bidestxistina Kurdistanê, bidestxistina hemû rojhilatê bû. Ev berê jî wisa bû, îro jî wisa ye. Ji ber ku Kurdistan dilê Rojhilata Navîn e. Hem ji aliyê stratejîk ve û hem jî ji aliyê dewlemendiya xwe ve wisa ye.

Di vê konferansê de ji bo ku tawîzan ji ereban û ji tirkan bigirin, kurdan jî ji xwe re dikin çek. Di civînê gengeşiya

sereke ev e: Ew dê kurdan li hemberî kurdan çawa bidin şixulandin. Û biryar tî girtin. Li gorî vê stratejiyê planê çêdikin, ku kurd bi tu carî nebin xwedî hêz di herêmê de. Heyanî bəriya PKK konevaniya wan bi vê rengî didomiya, bêyî ku tu hêz bersivê bide, wan ev siyaset dida meşandin.

Encama konferansa Qahîreyê wisa ye:

1) Pêwîst e başûrê Kurdistanê tevî Kurdistaneke serbixwe nebe. Yanê, ger biryarên Peymana Sewrê pêk werin û Kurdistaneke Serbixwe were avakirin jî, divê Başûr bi serê xwe bimîne.

2) Ji bo pêşerojê pêwîst e serdestiya Îngilîzan bi xurtî li ser Başûr were avakirin.

3) Ji bo tevgerên azadixwaz yên kurdan û ereban bi pêş nekevin, avakirina dewlete qirdik (kûkla) ji kurdan rê pêwîst e."

Belê, çawa îro Brîtanya, DYA dixwazîna Başûr ji Kurdistanê qut bikin, di wê demê de jî siyaseteke wisa dimeşînin. Çimkî, ger Başûr bi Bakur ve were girêdan, qet derfeta rêveçûna siyasetê hêzên împeryalist di pêşiyê de ya Brîtanyayê, hem li ser Kurdistanê û hem jî li ser dewletên Xelîcê tê tunekirin. Ya du-yemîn; çawa di wê demê de başûrê welat helqeya herî lawaz di rojhilata de ye, di wê demê da jî Başûr navenda siyasetê hemû hêzên ku dixwazîna li ser Rojhilata Navîn serwertiya xwe bidin meşandin bû.

Belê, îro PDK bi hemû hêza xwe siyaseta îngiliz û DYA'yê pêk tîne. Lê dema hinekî bi hûrbînî li ser dîrokê were rawestîn, wê bê dîtî ku Şêx Ehmet Barzanî, Mele Mustefa Barzanî û Mehmet Sîdîq ji ber êrişên firokeyên Îngiliz di sala 1930'yî de ji Başûr bazdan û hatin xwe spartin Tirkîyeyê. Lê wisa xuya ye ku Mesûd Barzanî qet ji dîrokê fêm nake an jî naxwaze fêm bike. Çimkî ger hinekî fêm bikira wê xweş bihata dîtî ku Îngiliz bûne sedema kuştina bi hezaran kurdan di wê demê de.

Îro jî qirkirinên ku li Kurdistanê tên meşandin (her çiqas DYA derketibe pêş jî), lê dîsa di bîngeha van qirkirinan de tiliya îngilîzan jî heye. DYA xwe mîna hêza yekem dibîne, Îngiliz jî xwe ji Kurdistanê berpîrs dibînin. Çimkî başûrê Kurdistanê mêtîngeha wê bû. Lewre ev her du dewletên împeryalist bi hev re siyaseteke kirêt li ser Kurdistanê dimeşînin. Helbet ev yekbûna berjewendiyên wan îfade dike.

Çi di konevaniya Hevpeymaniya Se-debât (1928) de çi jî di Hevpeymaniya Baxdayê (1955) de helwesta wan yek bû. Di van hevpeymaniyên de dewletên împeryalist yekbûna dewletên mêtînger (Tirkîyê, Îran Iraq) dane çêkirin.

Tevî ku ev hevpeymanî ji zû de ji navê hatine rakirin jî, lê her dem bi alîkariya DYA û Brîtanyayê, rihê wan hevpeymaniyên hatiye jiyandin. Her dewletê çend partiyê Kurdistanê bi xwe ve girêdane û li gorî konevaniya xwe ya herêmê wan partiyên didin şixulandin. Îro, di nehatina sedema beşdar nebûna wan partiyên di karê Kongreya Neteweyî de xwe diyar dike.

Siyaseta împeryalistan û şoreşa nûjen

Heyanî beriya çend salan van dewletên împeryalist dikaribûn ruhê hevpeymaniya Baxdayê bidana jiyandin. Lê îro şoreşa Kurdistanê ev ruh daye perçiqandin û ber bi tunekirinê ve dajo. Girêka bîngehîna a ku vî ruhî di Kurdistanê jindar dike bêguman PDK ye.

Dîsa ji bo standina hinek tawîzan ji Tirkîyeyê, (lê armanc ne bes standina tawîzan e), dest avêtiye karta Başûr û civînen mîna Dublin, Oslo û Enqereyê li dar dixin li hemberî PKK'ê. Wê demê jî bi karta Başûr ji tirkan û ereban tawîzan distînin, bi Konferansa Qahîreyê û Peymana Sewrê.

Lê îro gelê Kurdistanê bi serokatîya tevgera azadiyê hemû konferans û civînen wan vala derdixe. Çimkî ew stratejiya împeryalizmê û bi taybetî jî ya îngilîstanê û DYA'yê bi regekî xweş derxistîye holê. Ya herî girîng jî tevgera azadiyê hêza xwe ji gelên Kurdistanê û gelên Rojhilatî digire.

Taybetiya siyaseta îngilîzan ew e ku, tim vedişêre û di dawiyê de kartên xwe dide listin. Lê, tevgera azadiyê ew deşîfre kiriye, hêzbûn û dijwariya şoreşa Kurdistanê ev derfet ji dest girtiye. Girtina Kanî Yılmaz, alîkariya Tirkîyeyê, piştvanîya împeryalistan ji bo PDK'ê hemû mînakên balkêş in ku rûyê împeryalistan derdixin holê.

Di salên 1920'yî de gelek eşîrên başûr, bakur û rojhilatê welêt bi xwe ve dabû girêdan û li hemberî azadixwazên kurd, ereb, ermen û hwd. didan şixulandin. Lê îro jî xeynî eşîra Barzanî ew jî ne giş, tu



Şerif Paşa

tişt di dest de nemaye. Tevgera azadixwaz bi pêngava duyemîn re bi qasî ku li Bakur xurt e, li Başûr jî giraniya xwe da rûniştandin.

Ev şerê ku li dijî PDK'ê tê meşandin pir li zora hêzên împeryalist û di serî de ye Brîtanya dihere. Ji ber ku tevgera azadixwaz damara siyaseta Îngilîzan ya ku di konferansa Qahîre de dabû rûniştandin, cara yekemîn e di dîroka Kurdistanê de ku ji bin ve dide hejandin û ew ber bi tunebûne ve dihere.

Ev yeka hanê jî, care yekemîn e ku hêzekî Kurdistanî dikare hemû giraniya xwe deyne ser Kurdistanê û hemû derfeta konevaniyê ji dest Brîtanya bigire. Bêguman ev yek ne tiştêkî biçûk e. Derbe-ya ku vê tevgera nûjen li konevaniya Brîtanya daniye di Rojhilat de, sedema

Hinek rawşenbîrên kurdan baweriya xwe bi hêzên împeryalist anîn, lê hêviyên wan pûç derketin. Bo nimûne, balyozê Stocholmê Şerif Paşa, li ser navê kurdan beşdarî komciyêna Peymana Sewrê bû.

herî bîngehîna e ku, dewleta Îngiliz bi hemû derfetên xwe li hemberî şoreşa Kurdistanê bisekinin û alîkariyê bide Tirkîyê û PDK'ê.


Bi kinahî, Brîtanya bi tu carî jî bo berjewendiyên gelê Kurdistanê biryar negirtine. Şoreşa Kurdistanê bi mebusên wan da îtîrafkirin; ku ew çawa bûne sedema perçeqirîna Kurdistanê. Bêguman ger serokatîya şoreşa Kurdistanê ne xurt bûya, derfeta îtîrafkirina wan jî ne gengaz bû.

Belê, ger em xurt bin, yekîtiya xwe bi ser bixînin, wê dostên me pir bin û dijminê me jî kêmbin. Kongreya Neteweyî di vê alî de gaveke girîng e. Tevgera azadixwaz, bi têkoşîna xwe re li ber pêkhatina yekîtiya neteweyî vedike.

AHMET HÜSEYİN

Bang û hawar

CELALETTİN YÖYLER



Gelî kurdên ku li metropol û deverên cur bi cur ên cihanê dijîn! Hûn bi kotekî û bi zordarî ji ser axa welatê xwe hatine koçberkirin û dûrxistin. Tika û ricaya min ji we ew e ku, hûn ji çand û dîtîna û adetên neteweya xwe dûr nekevin. Dema hûn ji çand û adet û dîtînen welatên xwe dûr bikevin û kêfa xwe ji çand û dîtînen nîjad û neteweyêke din re bînin û xwe wekî wan bidine nîşan, wê demê hûn li dijî gelê xwe, welatê xwe, çanda xwe û tevgera rizgariyê îxanetê dikin. Lewra her gelek li ser rûyê cihanê bi adet û çand û wergirtinên xwe tê naskirin. Dema ku hûn van nîrxên xwe yên gelêrî û neteweyî jibîr bikin û lê nebin xwedî, wê demê hûn bi dijminê gelê xwe re dibine yek û dibin dijberê tevgera rizgariya neteweya xwe. Wekî çawa ku hûn di dîlan û dawetên xwe de, di şûna xêliya gevez de, spiyê qul qulî li bûkê bikin û ji

çanda gelê xwe dûr bikevin û di nava çanda gelekî din de, bihelin û winda bibin.

Bang û hawara min ji bo we ew e ku, hûn vê xirabiyê biterikînin û li çanda gelê xwe yê bîndest vegezin. Çima hûn ji çand û adetên bav û kalikên xwe direvin û şerm dikin? Gelo ku bûka we bi xêlî û temezî û dêriyê gelêrî û neteweyî be, ji mirovayetiya wê çi kêmbibe? Bi rastî tiştêkî ji mirovayetiya wê kêmbibe. Bi ser de hûn dibin alîkarê dîrok û çanda gelê xwe, serbilind û serfiraz û bi rêz û rûmet dibin. Lewre bi awayekî hûn xwe bi kesên ku her tim dixwazin we bihelînin û di nava çanda xwe de winda bikin, didine naskirin û didine diyarkirin ku em jî neteweyek in û xwediyê çand û huner û dîtîna û adetên xwe yên gelêrî û welatî ne.

Gelî heval û hogir no! Me gelê kurd tu caran li welatê xwe, bûkên xwe di dema dawet û dîlan de, nebiriye berber û porê wan kur nekiriye. Me keçikên xwe yên ku bûne bûk birine cem serhûnanên pîrek, wan serhûnanan serên wan şûştine û guliyên wan hûnandine. Dû re di gel hevaltiya çend keçikên bi navê "berbû" an çend jinikên bûkî û ciwan, destên wan hine kirine. Hem jî li berbû û jinikên li wê derê, li ser "bûkê" lawij û kilamên bi navê xerîbî

gotine. Gelo ev adet û çanda hane kevnare ya ku her malê gelê kurd e, emê ji wan fedî û şerm bikin? Divê em ji çand û adetên bapîrên xwe yên kevnare fedî û şerm nekin. Lewre ew çand û adet dîroka heyî û kevnarîbûna gelê me ne.

Her gel û netewe bi çand û huner û adetên xwe yên gelêrî û welatî û neteweyî têne naskirin. Em jî wekî wan netewe û gelên li ser vê cihanê bi çand û adetên xwe yên neteweyî û gelêrî çandî têne naskirin. Ji ber van sedeman li ser me kurdan jî pir pêwîst e ku, em jî wekî neteweyên din ji çand û adetên xwe yên gelêrî û neteweyî şerm û fedî nekin. Lewre em gelê kurd bi van taybetmendiyên xwe ji gelên din têne veqetandin û naskirin. Em gelekî bîndest û perçiqîne, bi dehan sal e ku welatê me ji hêla dagirkeran ve hatiye dagirkirin û talankirin. Her tim van dagirkeran xwestine ku me di nav çand û hunera xwe de bihelînin û tune bikin. Lê me hetanî îro li ber xwe daye û em nehatine helandin. Çi dema ku em li çanda xwe, adetên xwe û nîrxên xwe yên bi rûmet nebin xwedî û xwe ber bi çand û hunera dagirkerên welatê xwe bikêşînin, wê demê hûn hem xiyanetê bi doza serxwebûna xwe re dikin, hem jî dibine alîkarê dagirkerên welatê xwe.

“Kenê te azadiya min e”

**Hafiz li ser gora
te gotibû:
“Kenê te azadiya
min e.”
Bi hezaran mirov
jî di wê baweriyê
de bûn. Lewre yên
ku tu kuştibûn,
digotin gel wê haş
bibe. Lê gel
berxwedaneke
dijwar û serbilind
da. Belkî tiştêkî ne
baş be lê belê
mirina hin
mirovan car caran
dibe egera
hişyarbûna gelek
kesan. Piştî mirina
wan kesan gelek
mirov li xwe vedi-
gerin û jî binî ve
xwe diguherin.**



Ev gotin Hafiz ji bo te nivîsandibû. Roja ku tu ber bi jiyaneke nemir ve çûbûyî, wî li ser te nivîsandibû û wiha gotibû di wê nivîsa xwe de: “Dîsa derket pêşiya me tirsekê xayin. Lê ew nizanin ku em dê heta hetaya vê têkoşinê bimeşînin. Bi kuştina te pênuşa me herikbar tir bû. Kenê te azadiya me ye.”

Rojê nizanîm lê ji mehan avrêl bû. Me bûroya rojnameya Yeni Ülke li Batmanê nû vekiribû. Çend roj di ser re derbas bûbûn. Te bi dilekî germ gav avête bûroyê. Te pirozbahî li vekirina bûroyê kir û got: “Ev karekî gelekî girîng û pêwîst e ji bo gelê kurd. Divê her kesekî/e kurd alîkariyê bide vê xebatê.” Çend roj bi vî awayî derbas bûn. Tu her roj serê sibê bi min re dihatî bûroyê, êvarê jî bi min re vegeî mal. Wê demê ez bi tenê di bûroyê de dixebitîm. Pêwîstiya min gelekî bi alîkariya te hebû. Min ew pêşniyar li te kir.

Roja din jî te dest bi xebatê kir. Nûçeya yekemîn ku me bi hev re nivîsand, kuştina sixurekî (Sebrî Doğru) bû. Wexta ku me ew nûçe şande Amedê,

hevalên Amedê tavilê telefon vekirin û wiha gotin: “Hûn xwe li ku dizanin, nûçeya ku we nivîsandiye mirov bes dikare bi zor di Serxwebûnê de bide weşandin.”

Piştî van rexneyan em rûniştin û fikirîn. Me got, divê em vî karî bimeşînin. Demekê me newêribû em nûçeyan amade bikin. Lê dema ku me bi baldarî nûçeyên xwe honandin, hevalên ku rexne li me girtibûn, îcar telefon vekirin û em pîroz kirin.

Di destpêka xebata rojnameyê de te wiha digot: “Rojnamegerî ne peywîr e, peywîr welatparêzî ye. Em îro li vir di rojnameyê de dixebitin, siberoj li derekê din in.”

Lê her ku diçû te bi hêsanî rojnamegeriya xwe bi pêş ve dibir û nûçeyên ku te amade dikirin nav û deng didan. Nûçeya te ya herî bi nav û deng “Hizbullah Değil, Hizbikontra (Ne Hizbullah, Hizbikontra)” bû. Dema ku ev nûçe di rojnameyê de hate weşandin, gelek tehdît jî li dû hatin. Di vê demê de li Batmanê her roj mirovek ji aliyê kontrayan ve dihat kuştin. Ji wan kuje-

ran tu nedihatî girtin û ew her li ser kar bûn. Kuştinên kontrayî cara yekemîn li gundên Midyadê dest pê kir. Kontra bi çekên gerîla diçûn malên gundiyan, ew ji malê wan derdixistin û gulebaran dikirin. Gelek ji van bûyeran jî aliyê te ve wekî nûçe hatin ragihandin. Jixwe ew sernivîs jî piştî van nûçeyan hate nivîsandin.

Kesên kontra hêdî hêdî derdiketin holê. Yek ji van jî endamê Mîte Ahmetişıl Akça (Ahmo) bû. Ev mirov her tim bi tenê digeriya û ji bo çend cîneyên ku li dora Midyadê çêbûbûn, wekî kujer navê wî dihat bilêvkirin. Di dawiya berfanbara 1992’an de Ahmo hate kuştin. Tu dîsa ji bo nûçeyekê çûbûyî Kercewsê. Te telefon vekir û got: “Niha ez wisa difikirim ku çend meh li emrê min zêde bûn.” Piştî çend rojan jî du heb ji van kontrayan, hatin ji cînarên we pîrsa te kirin. Wê demê me zanibû ku tu jî xistine dorê. Lê te xebata xwe didomand. Te xwe neda alî.

Roja 24 reşemî. Serê sibehê ez hatim mala we, min xwest te hişyar bikim ku em bi hev re herin rojnameyê, lê go-

tin ku Cengîz gelek betiliye, bila hinekî din jî razê û dû re were. Ez çûm bûroyê.

Min wê roj tu li nexweşxaneyê dîtî. Xwezî min tu di wî halî de nedîtibûya. Çavê te hê jî bi ken bûn. Kena te tirs û xof xistibû dilan. Ji bo vê jî ne yek, sê kes ji van bextreşan tu xistibûn xefikê. Her yekî ji aliyekî ve berê çeka xwe dabû te.

Roja ku tu şehîd ketî, bi hezaran mirov hatin serdana te. Her kesî digot: “Bimre mirin!” Mirinê nikaribû te ji nav me bibe. Nexasim nebir jî. Çil hezar mirovî, tu ber bi jiyana bêdawî ve bi rê kirî. Niha jî dema ku Batman tê gotin, tu têyî bîra her kesî û serhildana li dijî kuştina te.

Min di destpêka nivîsê de jî got; Hafiz li ser gora te gotibû: “Kenê te azadiya min e.” Bi hezaran mirov jî di wê baweriyê de bûn. Ji ber ku yên tu kuştibûn, bawer dikirin ku wê ve yekê gel haş bibe. Lê gel berxwedaneke birûmet da. Belkî tiştêkî ne baş be, lê belê mirina hin mirovan car caran dibe egera hişyarbûna gelek kesan. Piştî mirina wan kesan gelek mirov li xwe vedigerin û jî binî ve diguherin. Hingî dema em binêrin em ê bibînin ku ne ku ew kes miriye, ji dîrokê re bûye simbol û maye. Şehîd ketina te jî her wisa ye.

Li Batmanê wê rojê hemû hêzên ewlekariyê ketin tevgerê. Nedixwestin ku cenaze bi wî awayî bê rakirin. Hêrs û lîxwedîderketina gel kir ku ew paş ve gavan biavêjin. Wisa mecbûr man ku li merasîma te ji dûr ve temaşe bikin. Hafiz û hevalên te yên ku di bûroyên din de dixebitî jî di cenazeyê de te amade bûn. Di rêwîngiya te ya dawî de nexwestibûn ku te bi tenê bihêlin.

Daxuyaniya ku li ser kuştina te hatibû nivîsîn wê Hafiz bixwenda, ew jî bi heyecan bû. Li goristanê derketibû ser latekî û wiha digot: “Dema ku wan tu kuştî wisa zan dikirin ku wê me hemûyan yeko yeko ji holê rakin. Ew nizanin ku rastî di tariyê de nemîne. Wê rûyên reş di demeke de kurt derkevin holê. Ew di tariyê de, em di ronahiyê de. Her dem ronahî rê nişanî mirovan dide. Em rêwîyê ve riyê ne. Cengîzek çû lê belê niha em hemû Cengîz in.”

Ji rojekê bi şûn de Hafiz di nivîsa xwe ya rojnameyê de gotibû: “Kenê te azadiya min e.” Di ser kuştina te re pir dem neborî, piştî te bi çar mehan ew jî hate bal te: Welatê abadîn ê ku ken lê azad dibe. Pişt re Yahya, dû re Huseyin, li dû wî Apê Mûsa, Kemal, Ferhat, Aysel, Nazim, Orhan û yên din tu bi tenê nehiştin, di pey te de hatin.

Pêşîn te rahişte alê, niha me rahiştiye wê. Em dê bilind bikin heta rojên azad. Hetanî wan rojan: “Kenê we azadiya me ye.”

HAYRETTİN ÇELİK

□ 22 reşemî 1992:

Rojnameya Welat dest bi weşanê kir

Rojnameya Welat di 22'ê reşemîya 1992'an de li Stenbolê dest bi weşanê kir. Rojname hefteyî bû, ji 16 rûpelan pêk dihat û bi zaravayên kurmançî, dimilî û soranî dihat weşandin. Rojnameya Welat, piştî 115 hejmaran mecbûr ma ku weşana xwe rawestîne. Zübeyir Aydar xwediyê rojnameyê bû. Gerîndeyê Giştî yê Weşanê di destpêkê Abdullah Keskin bû, piştî re, Berpîrsê Karê Nivîsaran Mazhar Günbat ew kar jî girt ser xwe.

BÛYERINE JI DÎROKÊ

□ 24 reşemî 1992:

Rojnameger Cengiz Altun şehîd ket

Nûçegihanê Yenî Ülkeyê Cengiz Altun li taxa Aydınlıkevler a li ser Batmanê, nêzîkî Mizgefta Hecî Şêrin bi 7 guleyên keleşnikovê, ji hêla hizbî-kontrayan ve hate şehîdkirin. Bi pey agahiyên kesên li derdora cihê bûyerê, Cengiz Altun, ji hêla 3 kesên ve hatiye gulebarankirin. Piştî kuştina Cengiz Altun, gelê Batmanê rabû ser piyan û bi xwepêşandaneke ku 40 hezar kes tê de beşdar bû, bi rengên kesk û sor û zer Cengiz Altun hate hilanîn.

Kongreya Înstîtuya Kurdî ya Pêncemîn çêbû

Înstîtuya Kurdî a Stenbolê kongreya xwe ya pêncemîn, di roja 14'ê reşemîya 1998'an de li NÇM'ya Beyoğluyê li dar xist. Di destpêka kongreyê de ji bo Musa Anter û hemû şehîdên şoreşê rawestîna rêzgirtinê pêk hat. Ji bilî endamên çapemeniyê, nêzîkî 150 kes beşdarî kongreyê bûn. Di kongreyê de, Feqî Huseyin Sağnîç, Lêkolîner Torî, Seroka Giştî ya NÇM'yê Nuray Şen, Serokê KÛRT-KAV'ê Yılmaz Çamlıbel, Xwediyê Azadiya Welat Celalettin Yöyler, Cîgirê Serokê Înstîtuya Kurdî Hasan Kaya, Gerîndeyê Giştî yê Azadiya Welat Sami Tan, Serokê Înstîtuya Kurdî a Stenbolê Şefik Beyaz û Nivîskar-Lêkolîner İsmail Göldaş amade bûn.

Berî ku diwana kongreyê bê diyarkirin Şefik Beyaz li ser xebatên Înstîtuyê nîrxandinekê giştî kir. Beyaz, bal kişand ser girîngiya têkoşîna çandî û pêwîstiya bisazîbûnê destnîşan kir. Dirêjîya vê nîrxandinê wiha bû: "Neteweyek nikare bê çand û huner bijî. Neteweya ku ji huner û çanda xwe dûr be, ji rastiya xwe jî dûr dibe. Ji bo pêşketina çand û hunera kurdî jî divê kurd birêxistin bikin. Sazî jî bi rewşên bîr û peşengên xwe xurt dibe. Û tenê ne bi rewşên bîran, bi gelê xwe sazî xurt dibe. Alternatîfêke din ne gengaz e." Şefik Beyaz, li ser rojeva îro jî rawestîya û got ku, gelê kurd têkoşîneke mezin daye û her roj şehîdan û bedelên mezin dide. Wî daxuyakirin ku bi wan şehîdan netewebûna kurdan çêdibe, ne ew şehîd bin wateya netewebûnê namîne.

Piştî axaftina Şefik Beyaz diwana kongreyê, ku ji Refik İncir, Mustafa Avcı û Mülazım Özcan pêk dihat, hate hilbijartin. Pêşîn rêznameya înstîtuyê hate xwendin û piştî re kesên ku di wî warî ramanên xwe bin zîmîn, dest bi axaftinê kirin. Piştî xwendina rêznameyê, Cîgirê Serokê Înstîtuya Kurdî ya Stenbolê Hasan Kaya rapora

xebatên înstîtuyê pêşkêş kir. Gerîndeyê Azadiya Welat Sami Tan jî li ser wateya kongreyê rawestîya û got ew jî perçeyekî xebatên înstîtuyê ne. Tan behsa helwesta İsmail Beşikçi ya ji bo zimanê kurdî jî kir û got ku helwesteke bi vî rengî pêwîst e.

Nivîskarê Rojnameya Hêvî Felat Dilgeş jî serinc rakîsand ser girîngiya şoreşa çandî û da zanîn ku bîyê şoreşa çandî li cihanê tu şoreş pêk nehatine. Felat pêşniyarên xwe jî wiha rêz kirin: "Divê perwerdekirina civaka kurd bê kirin. Ji bo vî yekê jî pirtûkên

klasîk ên zarokan pêwîst e bo kurdî bîn wergerandin. Kovarekê edebî divê bê derxistin."

Nivîskar İsmail Göldaş bi axaftina xwe ya hestiyar û tûj bala beşdaran kişand. Wî qala "İnsiyatîfa Sivil" kir û ji ber helwesta xwe ya alînegir ew rexne kir.

Göldaş piştî re jî diyar kir ku divê ronakbîrên kurd bê teref nebin, terefgir bin. Göldaş ev serdem wekî serdemê dirokî bi nav kir û wiha axivî: "Ev roj ji bo kurdan rojên dirokî ne. Ku me ev şans jî ji dest da, careke din em bi hêsanî nikarin rabîn ser piyan. Divê em li nîrxên ku heta îroj hatine afirandin xwedî derkevin. Û divê em ji xwe mantalîteya ku dibêje: 'Kurd nikarin tiştêkî bikin' xwe veqetînin."

Ji van kesan pê ve Torî, Raif Yaman, Kerem Soylu, Feqî Huseyin Sağnîç û hin kesên din axivîn.

Piştî van axaftinan listeya kesên ku we di kargerîya înstîtuyê de kar bikin ji hêla endamên ve hate pejirandin. Serokê nû yê înstîtuyê jî wê ji aliyê kargerîya nû ve bê hilbijartin.

Ji bo kongreyê TUHAD-DER, Hêvî, DBP, Çiya Mazî, Hasip Kaplan, Çemşîd Bender, İsmet Şerîf Wanlî, Hüseyin Kartal, NÇM û Înstîtuya Kurdî a Brükselê peyama (mesaj) şandin.

ŞEXMÛS ÖNAL

**ÇAVDÊRÎ**

Nivîsa nivîskarê me nekete destê me



AMED TÎGRÎS

Mîne Xanim çû ser dilovaniya xwe

AHMET BARAÇKILIÇ

Ew dayika Kurdistanê, dilovana pakrewanan, evîndarê axa niştîman û hêviya goristana Mahabadê bû.

Belê ew tenê heştê salî jiya. Ev jiyana xwe de seranser li bûyer û çalakiyên ku kêm caran pêk tên, rast hat. Mîne Xanim: Di van heştê salên borî de, ne tenê bi rûpelekê ne ji bi pirtûkekê û bi serpêhatiyên xwe bûbû şahîdê dirokekê tirajedîk, ku bi xwîn û hovane bû. Gelek jenosîd û talan bûn û hatin ji bîrkirin.

Dayika Mîne di gel wan mercan, di temena xwe ya 80 salî de, jiyana xwe bi dijwarî di heps û zindanan de û li koçberiyê berdewam kir. Ji bo wê her tişt hêsan bû, lê mirina li welatên biyanî zaf dijwar û çendî wê jî xemgînî bû. Bele, me got, ew hêviya goristana Mahabadê bû û dijminê mirina li derveyê Kurdistanê bû. Berî niha mehekî ji bo hilgirtina dil û xatiran em careke din bi rêzanî çûn serdana wê. Awêrêya wê erdnîgariya Kurdistan, bejna wê, kamaxbûna gundên kurdan, zimanê wê, perçebûna kurdan, rewş û livên wê, banga hevgerîtin û cengê dida xuyan. Dema behsa neyar dibû, por li serî wê gij dibû. Dema behsa artêşa kurd û keçên gerîla dibû, rû bi ken dibû. Ala ku di sala 1945'an de, li Qada Çarçira pêl dida, mîna ku di neynika çavê mirovan de dibîne temaşê dikir. Belê, mirov dikare gelek tiştan bibêje, lê ew hêz û huner nîn e ku mirov bîkeve cihana wê ya rengîn a ku bi evîn û axîna goristana Mahabadê mişt dagirtîye.

Mîne Xanim(xatun) di sala 1908'an de ji dayika xwe bûye. Li dijî hemû astengên civakî, siyasî jiyaneke

gelek taybet û balkêş jiyaye. Ew ji malbatakê navdar e û malbata wan ku safrê navdar Hejar jî ji wê malbatê ye û ji malbata (Hesen Xalî) wê gelek di cenga cihanê ya yekemîn di şerê dijberî rûsan de şehîd ketine. Ew di sala 1930'de bi Serokê Komara Kurdistanê Qazî Muhammed re dizewice. Dayika pênc keçan û kurekî ye. (2 keç şehîd bûne, kure wê jî Eli Qazî ye û bi navê lawikê reş tê nasîn). Mîne Xanim û malbata wê di sala 1980'an koçî cihekî ku 2000 km dûrî Mahabadê kirine.

Dayika Mîne; di sala 1984'an di dema Xumeynî de jinekê 76 salî bêsêdem 11 mehan kirin hepsê û bi hovîtiyekê mezin tadayî û îşkence lê kirin. Nexweşiya ku ji wir girt mixabin careke din ji jî wê nexweşiyê rigzar nebû. Temenê û serpêhatiyê wê bi şoreşa 1945'an û bi jiyana şehîdê netewî Qazî Muhemmed ve girêdayî ye. Ew hêmin, fedakar û dilsozê gelê xwe bû. 7 salan tazahiya Qazî Muhamed û 50 salan jî bîranîna wî bi cih anî. Her dem hewl dida ku cihê Qazî Muhammed bigire. Di her warî her dem balkêş bû. Yekîtiya Parlamentêrên Elmanya Mîne Xanim bi rêzgirtineke mezin ji bo parlamentoyê vewwendin.

Nexweşiya wê ya dijwar (zêredan) di sala 1997'an de lê zêdetir kir û mixabin doxtoran çareyekê ji bo nexweşiya wê nedîtin. Ji bo wê bi lez xwe amade kiri ku xwe bigihîne bajarê Mahabadê, cem hevrêyê xwe yê jiyane Qazî Muhammed. Belê berî mehekê ji Elmanyayê çû Tahrânê û wê berî mirina xwe 2 rojan xwê gihand Mahabadê û di şeva 17.02.1998'an de çû nik Qazî Muhamed.

Berpirsê Giştî yê Rojnameya Her çand li ser bin

ROBER HADDELER

Di sala 1926'an de li Bakirköya Stenbolê hate dinyayê. Di sala 1944'an de "Dibistana Mihatarayan" ango bi navê îro, Lîseya Pangaltî kuta kir û di heman salê de li Zanîngeha Stenbolê li Fakûlteya Edebiyatê dest bi perwerdehiya bilind kir. Di sala 1946'an de dest bi nivîsandina bi ermenî kir. Heta niha 25-30 pirtûkên wî ku bi ermenî hatine nivîsin, çap bûne. Çend ji wan pirtûkên girîng ev in:

Rojnivîsk (Huşadêr); Kelîme Oynû (Lîstina bi peyvan); Însanların Büyüklüğü ve Zavallılığı Hakkında (Der barê mezinahî û rebeniya mirovan de)



Xwedî û berpirsê Giştî yê Rojnameya Rober Haddeler

Birêz Rober Haddeler, wisa xuya dibe ku rojnameya Marmara xwedî temenkî dirêj e. Geolo hûn dikarin bi kurtasî rojnameya xwe, ji destpêkê heta îro bidin nasîn

✗ Rast e, rojnameya me xwediyê temenkî dîv û dirêj e. Ji sala 1940'î û vir de bi rêkûpêk, bêyî ku rojekê jî navberê bide weşana xwe, hatiye weşandin. Rojname berê 7 rojan derdike, lê piştî re ji ber ku roja yekşemê di warê belavkirinê de astengî xwe didin der, me biryar girt ku rojname roja yekşemê dernekeve. Niha rojname di hefteyê de 6 rojan derdike. Rojname di sala 1940'î de ji hêla Suren Şamliyan ve hate derxistin, ji sala 1967'an û pê ve jî rojname di bin însiyatifa min de derdike.

Bêguman her rojname xwediyê xetke weşanê ye. Xeta weşana we çawa ye?

✗ Doza me ya sereke ew e ku; em bin alîkar û piştgirê çanda gelê ermenî. Lê hêla din em gelek pêwîst û giranbûha dibînin ku zimanê zikmakî ango ermenî bi pêş ve bibin. Wekî din em xwe mecbûr dibînin ku em li Stenbol, Antoliya, Mezopotamya û ermeniyên ku li seranserê dinyayê belav bûne li ser bûyer û qewimînên ku wan eleqeder dike, agahdar bikin. Ji ber ku her gel li ser kok û binyata xwe, li ser çand û zimanê xwe, li ser lingan dimîne.

Em xwe wekî notirvan û parêzerê nasname û zimanê xwe dibînin. Ma qey hûn ne ji bo zimanê kurdî, çand û diroka kurdî rojname derdixin?... Belê!... Ji ber ku zimanê ermenî zimanekî gelek spehî, xweşik û bedew e, ji bilî bûyerên rojane em cih didine wêje, çand û nivîsên dirokî. Em bi biryar in ku em zimanê xwe biparêzin. Li aliyê din li Stenbolê gelek nivîskarên baş hene û ji bo me dinivîsin.

Tê gotin ku gelek nivîskar û romanivîsên ermenî ku îro gelek navdar in pêşî li Marmarayê dest bi nivîskariyê kirine. Mirov dikare rojnameya we wekî dibistanê bi nav bike?

✗ Bêguman em dikarin bibêjin ku, îro piraniya nivîskarên ermenî ku li Tirkiyeyê bûne ekol û ev ekol êdî îro ji sînorên Tirkiyeyê derbas bûye, di Marmarayê de nivîsîne, li wir xwe gihandine û perwerdehiya wêje û rojnamegeriyê li wê derê kuta kirine. Wekî mînak nivîskarê navdar ku Diyarbekirî (Amedî) ye, Migirdîç Margosyan li Marmarayê dest bi nivîskariyê kiriye. Li hêla din Hagop Munzurî ku ji derdora Dêrsimê ye û der barê wan herêmên kurdan de çar pirtûk nivîsîne, didu ji wan li zimanê tirkî hatine wergerandin, li Marmarayê dest bi karê nivîsinê kiriye. Wekî din Hamparsûm Gelenyan (Hamadag) ku li Amerikayê jiyana xwe domandiye, di rojnameya me de dest bi nivîskariyê nekiriye, lê gelek nivîsên wî di rojnameyê de çap bûne. Di vî warî de wekî we jî got Marmarayê rê ji gelek nivîskar û rojnamegeran vekiriye û ji bo wan bûye wekî dibistanekê.

Civaka ermenî ya ku li Stenbolê dijî, di rojnameyê de wîha de çiqas xwe dibîne?

✗ Civak û cemaeta ermenî rasterast xwe di rojnameyê de dibîne. Der barê jiyana civaka ermenî de çî diqewime, bi awayekî berfireh em di nivîsên xwe de cih didinê. Di serî de ez dixwazim bibêjim ku di nav civaka ermenî de hestên olî gelekî girîng in, giranî û pêwîstiya dêran gelekî diyar û eşkere ye. Mesela her yekşem li dêran ayîn tene kirin, li dibistanên me civîn tene lidarxistin, pere tene civandin ji bo alîkariyê. Wekî din navenda çandên ên ermenyan hene, çalakiyan pêk tîni. Pêwîst e ku em van gişan

di rojnameya xwe di bi cih bikin, ji bo ku gel xwe baştir tene de bibînin. Li aliyê din bûyerên politik ku bandor li ser ermeniyên Stenbol, Anatoliyayê û Ermenistanê dikin, di nava rûpelên rojnameyê de cih ji xwe re dibînin.

Hejmara rojnameyên ku hin çap dîkin çiqas e, bi wê ve girêdayî hûn dikarin nîfûsa ermeniyên Li Stenbolê û tiraja xwe bidin ber hev?

✗ Mixabin bersiva wê pirsê ji bo me neyînî ye. Ji ber ku hejmara rojnameyên ku em çap dîkin û nîfûsa gelê ermenî li Stenbolê hev nagire. Li gorî lêkolînên me îro li Stenbolê 80 hezar ermenî dijîn. Lê tiraja rojnameya me di navbera 2.000-2.100 î de diçe û tene. Ev jî tene wê maneyê

ku piraniya civaka ermenî yan bi zimanê ermenî naxwîne yan jî nikare bixwîne. Di nav hejmarê 80 hezar kesî de hejmara kesên ku nikarin an jî nizanin bi ermenî bixwînin gelekî zêde ye. Lewre jî ev tesîrê li tirajê dike.

Hûn dibêjin rewş nebaş e, zimanê ermenî baş nayê xwendin, lê ji bilî Marmarayê, Jamanak û Agos jî bi zimanê ermenî derdikevin û herî hindik ew jî 5-6 hezarî difiroşin.

✗ Bêguman di vî warî de hûn mafdar in. Rast e. Îro heger rojnameya me du hezar rojname bifiroşin jî, ji 10 hezar zêdetir tene xwendin. Rojname bi destan tene belavkirin, em rojnameyê hindik be jî dişînin welatên ewrûpî li wê derê jî rewş wiha ye. Her çiqas di warê aborî de ev yek li me tesîr neke jî di warê xwendinê de ji me re dibe dilgeşiyêke bêhempa.

Hûn bi şeweyekî çawa belav dikin û bi piranî li kîjan tax û herêman rojname tene belavkirin û xwendin?

✗ Şeweyê belavkirina me zêde ne modern e. Li aliyê din em wekî çapemeniya tirk ne xwedî derfet û îmkânên belavkirinê ne. Bi giştî em bi îmkânên xwe rojnameyê didin belavkirin. Serbelavkarekî me heye, ev serbelavkar rojnameyê dide dikan û pirtûkxaneyên ku gelê ermenî li wan derdoran dijî. Xwendevanên me jî her roj piştî saet çaran diçin û rojnameyên xwe ji wan deran dikirin. Her wiha gelek tax hene ku belavkarên me rojname mal bi mal digerin. Ev şeweyê

Li Tirkiyeyê medya jî qelîte û serbixwebûna xwe gelekî dîr e û kesên ku qelîteyê dixwazin hindik in. Xwendevan nûçe û qewimînan naxwaze, firaq-miraq û coca cola dixwaze, medyaya tirk jî radibe di cihê nûçeyan de van tiştan didê. Heger rojnameyek ne bi nûçe û şîrovayên xwe, lê ji bo firaq-miraqan tene firotin, di wê rojnameyê de xêr nemaye.



Xebatkarên rojnameyê Ani Kahvecioğlu

Marmara Rober Haddeler: yata xwe geş dibe

we zêde ne sazkar e. Mixabin ji ber ku em ne rojnameya berbangî (şeveqî) ne, em rojnameyê nivroyî ne. Lewre jî em nikarin ji vê yekê cudatir belavkirinê bikin. Bi piranî rojnameya Marmarayê li navçe û taxên mîna Şişli, Feriköy, Nişantaşı, Kurtuluş, Pangaltı, Bomonti, Bakırköy, Beyoğlu, Taksim, Yeşilköy, Kumkapı, Adalar, Kinalıada, Kadıköy û hwd. ku civaka me li wan deran jiyana xwe didomîne, tê xwendin.

Di warê çapemeniyê de zehmetî û dijwari li ber we hene?

✘ Ev pirs gelek ji min tê pirsîn, ez dikarim bibêjim ku ev 31 sal in ku em vê rojnameyê derdixin, lê heta niha ji bo me pirsirêkên dijwar çênebûne. Car caran di warê îdarî û polîtîk de hinek astengî û zehmetî derketibin pêşiya me jî, vê yekê zêde tesîrê li kar û xebatên me nekiriye.

Duh jî û îro jî bi qasî ku em dibînin, bi çavekî baş li hindikahiyên Tirkiyeyê (çi ermenî û çi jî rûm) nayê mêzekirin. Hûn vê helwestê çawa şîrove dikin?

✘ Mixabin nêrîneke bi vî rengî li Tirkiyeyê tê ditin. Lê em vê nêrînê nikarin ji bo peywendiyên di navbera gelên Tirkiyeyê de bibêjin. Ji ber ku tu car di navbera gel û hindikahiyên de nakokî û alozî derneketine. Heger derketibin jî bi destê xêrnexwazan ev yek pêk hatiye. Lê ne bi tenê li Tirkiyeyê li tevahiya cihanê, li hemberî hindikahiyên nêrîn û nêzîktêdayînên xirab û nexweş hatine ditin. Ew kes û dezgehên ku bi çavekî

nebaş li ermenî, rûman mêze dikin, kêmtir in ji kesên ku bi awayekî baş nêzikî wan dibin. Îro li Tirkiyeyê di vî warî de hindikahiya ku rewşa wan baş e cihê ne angî ermenî û rûm zêdetir zehmetiyê dikşînin.

Bi taybetî li Stenbolê di 6-7'ê rezbera 1955'an de li dijî can û malê hindikahiyên bûyerên nebaş qewimin. Gelek dikan û avahiyên wan hatin şewitandin û talankirin. Gelo bûyerên wê rojê di serî de ermenî, çiqas bandor li ser hindikahiyên hişt?

✘ (Demekê bêdeng dimîne û keserekê dikişîne...) Mixabin bûyerên 6-7'ê rezberê ku di sala 1955'an de pêk hatine, tesîreke xedar li ser hindikahiyên hişt û ne îro û ne jî hetanî ku em sax bin, em wan rojên reş nikarin ji mêjiyê xwe derxin û bavêjin. Piştî wan qewmînan bi hezaran dost, pîsman, heval û hogirên me bi taybetî ji kesên ku di temenê me de bûn, ji layê derûnî ve têk çûn, bi rojan bê tevger û lebat man, êdî nedixavîvî jî. Tabî ev tiştên ku min gotin, bi tenê bandora li ser manewiyat û psikolojiya hindikahiyên tînin zimên. Li aliyê din jî aliyê maddî ve xisar û ziyarên giran gihîştin me. Li gelek tax û navçeyên Stenbolê bi taybetî jî li Taksim û Beyoğloyê dikan û avahiyên ermenî, rûm bûn hedefên êrişan.

Bêguman qewmînan bi vî rengî, baweriya hindikahiyên li hemberî dewletê jî holê radikin. Êdî dema dewleta tirkî ev qewmînan tê hişê mirovan di mêjiyan de pîrs çêdibin û mirov dibêje: "Ge-

Doza me ya sereke ew e ku; em bibin alîkar û piştgirê çanda gelê ermenî. Em gelek pêwîst dibînin ku zimanê zikmakî bi pêş ve bibin û em xwe mecbûr dibînin ku em li Stenbol, Anatoliya, Mezopotamya û ermeniyên ku li seranserê dinyayê belav bûne, li ser qewmînan ku wan eleqeder dike, agahdar bikin.

lo?!". Tabî di warekî din de jî bawerî tê şikandin ev jî "Varlık vergisi" (baca taybet) a ku dewlet bi tenê ji kesên ne musliman in distîne. Êdî em naxwazin tiştên bi vî rengî pêk werin.

Kesekî wekî we ku ev bûyer bi çavê serê xwe difîne, dikare biranîneke ji wan rojan ku tu car ji bîra wî naçe, vebêje?

✘ Bi rastî ez vê bûyerê tu car ji birnakim; bi awayekî balkêş ez ji bûyerê haydar bûm. Ji ber ku wan rojan li İzmirê "Fuara Navneteweyî" ya ku her sal di vê mehê de pêk tê, dest pê kiribû û ji ber ku li İzmirê pîsmanên me jî hebûn em çûbûn İzmirê. Roja 6'ê rezberê saet li 5'an ji bo ku em vegehin Stenbolê em li keştiyê siwar bûn. Dinya gelek xweş bû, haya kesî ji bayê felekê tune bû. Dotira rojê ango 7'ê mehê em li Karaköyê ji keştiyê peya bûn. Bêdengiyê gelekî mezin hebû, tu caran min derdora Karaköy, Eminönüyê hew qas bêdeng nedîtibû. Her ku diçû ez bêhtir ditengijim. Gelo çi qewimibû? Min xwe hew girt, ez ber bi barkêşekî ve çûm. Min got: "Çi qewîmiye bira?" Barkêş gotina min wisa li min vegehand: "Qet nepirse keko, qet nepirse! Stenbol duh heta berê sibê serobino kirin!" Bi rastî jî hêj li wê derê eşkere dibû ku her der wêran bûye, talan bûye û hatiye şewitandin. Toz û talizok û dûxana avahî û dikanên ku hatibûn şewitandin gelekî zelal xuya dikir.

Vê bûyerê tesîr li rojnameya kir gelo. Marmarayê wan rojan çawa behsa bûyerê kiribû?

✘ Wê gavê ez ne berpîrs bûm di rojnameyê de. Lê dîsa jî der heqê bûyerê de gelek nivîs hatibûn nivîsin. Lê piştî di salvegera van bûyeran de min gelek caran li ser 6-7'ê rezberê, di rojnameyê de nivîsand.

Birêz Haddeler, hûn çapemeniya tirkî ku di van salên dawî de piraniya wan bûne kartel û holding, çawa dinirxînin?

✘ Ez ji serî heta binî rewşa çapemeniya tirkî ku îro tê de ye bi awayekî nêyînî dinirxînim. Li Tirkiyeyê medya ji qelîte û serbixwebûna xwe gelekî dûr e. Niha rastiyeke din jî heye, li Tirkiyeyê

xwendevan qelîteyê naxwazin ango kesên ku qelîteyê dixwazin hindik in. Xwendevan nûçe û qewmînan naxwaze, firaq-miraq û coca cola dixwaze, medyaya tirkî jî radibe di cihê nûçeyan de van tiştan dide. Ez di rojnameyan de belavkirina diyarî ango promosyonan tawanbar û şermezar dikim. Heger rojnameyek ne bi nûçe û şîroyeyên xwe jî ji bo firaq-miraqan tê firotin, di wê rojnameyê de xêr nemaye.

Îro çapemeniya tirkî yekîtiya di nav civak, yekîtiya di nav gel û hindikahiyên de naxwaze pêk were, provakasyonên xirab saz dike. Helbûkî divê rol û giringiya rojnameyê zêdetir be. Tê gotin çapemenî û medya li Tirkiyeyê "hêza çaremîn" e, lê di vî warî de rola xwe di aliyê xirab de bi kar tîne. Dev ji pêkanîna yekîtiya nav gel berdin, îro çapemenî di nav xwe de bi xwe belav wela bûye. Ew bi xwe jî hev aciz dibin, ji hev re çêran dikin, dibezin hev lê, bi gotinên xwe gelê ermenî û rûm rencide dikin. Ez dixwazim di vî warî de mînakê bidim: Heke ez ne şaş bim, rojnameyekê, ji xwediyê rojnameyê din re rabû û got: "Ermenî çoçuğu (Kurê ermenan)" ê din radibe dibêje: "Rûm çoçuğu (kurê rûman)" li wir ne ku ew kes ermenî yan jî rûm in, dibe ku kalikê kalikê wan bavfile (ne misilman) be, lê bi tenê ji bo ku navekî xerab lê bike, dibêje ermenî an rûm. Em hêvî dikin ku çapemenî hurmetê nîşanî gelên ku li Anatoliyayê dijîn bide. Li aliyê din rojnameyên mezin tev bûne xwedî holding û kartel ev jî di serî de li ser keda karker û kedkaran pêk tê, ev yek jî xirab e.

Wekî gotina dawî hûn dixwazin çi bibêjin?

✘ Li Tirkiyeyê; ji bilî zimanê tirkî, derketina weşanên bi zimanên din; çi kurdî, çi ermenî, çi kirilî û îbranî gelek zor û zehmet e. Lê di vî warî de rewşa kurdî gelek cuda ye û zehmetiyên li ber we li gorî zehmetiyên li pêşiya me gelekî zêdetir û dijwartir in. Lewre jî karê ku hûn dikin zêde zehmet e û hew qas jî pîroz e. Di vî warî de em we pîroz dikin û di karên we de jî we re serkeftinê dixwazin.

SALIHÊ KEVIRBIRÎ



Rober Haddeler û Rober Hamamciyan (Berpîrsê belavkirina xwe)

Hevpeyvîn bi Diya Ciwan re:

Têkiliya nûjenî û kevneşopiyê pêwîst e

Wekî tê zanîn jin û bi taybetî jî jina kurd di warê xwendin û nivîsandinê de, li kelem û dijwariyan rast tê. Gelo dijwariyên nivîsandina jinê, di civaka me de çi ne?

□ Di nêrîna min de, di tevahiya cihanê de, tiştên ku jinê ji xwendin û nivîsandinê bi şûn de dihêlin, berpirsiyarên wê yên xweristî ne ango mal û zarok in. Bi taybetî ji bo jina kurd dijwarî ne tenê di riya xwendin û nivîsandinê de ye, jiyana jina kurd hemû di dijwariyê de dibore. Dijwariya jiyana wê bi sedan tiştê hêja û girîng di hundirê wê de dişewitîne.

Diya Ciwan hem dayik e hem jî nivîskar e. Çawa hûn di navbera nivîsandin û dêtiyê de dixebitin?

□ Belê, ez pêşî dayik im, paşê nivîskar im û di navbera herdukan de jî terzî me. Ez dema xwe di navbera wan de behir (par) dikim, ta ku tu behir ji min re na min in. Lê her peyxama min ya pêşîn perwerdekirina zarokan e. Bi rastî ez pir diwestim lê vhesandina herî xweş di wê westanê de dibînim.

We başûr ziyaret kir, we rewşa wir ji nêzik ve dît. Hûn dikarin rewşa başûr bin ziman, bi taybetî rewşa çandî?

□ Çûna başûr li gorî min xewneke şeva bû lê bi roj pêk hat. Bi rastî hemû cureyên başûr mîna bihustê dihatin ber çavên min. Bi taybetî di warê çanda kurdî de ji perçeyên din zengîntir e û li gorî ku min dît dezgeh û tevgera başûr ya çandî û toreyî ne kêmi yên dewleteke serbixwe ne.

Toreya kurdî bi gelek zaravayan tê nivîsandin û her yek dûtir yê din xebatê dîkin û çareserkirina wê pirsê di pêşerojê de hûn çawa dibînin?

□ Di nêrîna min de, ta ku zimanekî taybetî jî nivîsandina kurdî re pêk we re û ew ziman bibe biryarek li ser tevahiya kurdan, divê Kurdistan azad û serbixwe be. Karê wiha mezin bêguman karê dewletan e.

Wekî em dibînin, nûjenî bûye armanca her nivîskarê/a nû û wê yekê hiştiye ku ni-



Diya Ciwan

Di cihanê de, her tişt li gorî demê tê guhertin. Dema ku kurê min şal û şapikên bavê min li xwe neke ne kêmanî ye ango mirov nikare bibêje ku guhertin nexweşiyek e bi ser torê de hatiye û yan jî bila kevneşopî bi saxîfî xwe veşêre.

vîsandinê bidertên wekî hev bin ango berhemên nû pir dûtir berhemên kurdî yên kevn nîn. Hûn vegera bal bi wêjeya kevnare çawa dibînin?

□ Di cihanê de, her tişt li gorî demê tê guhertin. Dema ku kurê min şal û şapikên bavê min ên Botanî li xwe neke ne kêmanî ye ango mirov nikare bibêje ku guhertin nexweşiyek e bi ser torê de hatiye û yan jî bila kevneşopî bi saxîfî xwe veşêre. Di nêrîna min de têkiliya di navbera nûjen û kevneşopiyê de, mîna têkiliya di navbera zarok û dê û bava de ye. Pirs girîng di wê babetê de, ew e ku mirov bibêje ka ev tore ye yan na?

Her nivîskarek dikeve bin tesîra nivîskarên din. Diya Ciwan bi kê tesîr bûye?

□ Rêzdarên min ji hemû nivîskaran re hene. Yên ku min ew xwendin û yên ku min ew nexwendin jî lê xweş dizanim ku min di bin bandora kurdayetiyê de nivîsiye. Tenê di bin bandora êşa neteweya xwe de dirazim û dirabim, dijim û dimirim.

Ta niha di kurdî de toreyeke taybet ji bo zarokan nîn e. Gelo çawa û çi pêwîstiya wê toreyê heye?

□ Ax ev pirs devê birfinan vedike. Ta îro jî bo zarokên kurd welateke azad tune ye. Nan û aveke paqij tune ye, jiyaneke rûspî û bêtirs tune ye. Wê çawa toreyekî taybetî ji bo wan hebe, tevî ku pêwîstiya toreyê ji zarokan re, ne kêmi pêwîstiya nan û avê ye jî, lê her nan û av û tav û ax pêwîstiyên pêşîn in ji bo wan.

Sala 1998'an sala rojnamegeriya kurdî ye. Di nêrîna we de rojnamegeriya kurdî çi armanc pêk anîye di wê sedsalê de?

□ Di nêrîna min de gelek gavên mezin avêtiye lê li gorî êşa kurdî pir biçûk û hindik in.

Piştî "Pêlek ji Deryayê Govanên Me" çi berhemên we yên nû hene?

□ Niha du berhemên min di çapê de ne. Yek ji helbestan pêk tê. Ev pirtûk bi navê "Hêstirin Ziwa" ye, a duyemîn kurteçirok in û bi navê: "Bazbend" e.

HEVPEYVÎN: JANA SEYDA

Kanî, şaîrê kurd

Yek ji keçên jêhatî yên Kurdistana Îranê, ku kar û barê pir baş ên edebî û çandî dike Kanî ye.

Navê wê yê rastîn Fatime Husên Penahî ye. Di şeva Newroza sala 1356'an de hetawî Rêkevtê 1977'an li gundê Tazawaya bajarê Senedecê hatiye dinê. Bab û kalên wê hemû ji gundê Werzêr bûn. Piştî çend salan hatine Senedecê. Li wê derê ders û wanê xwe tamam kiriye. Kanî êsta bi kurdiya soranî pir baş şeîr û kurteçirokan dinivîse. Her wiha ev keça kurd dikare ku şeîr û gotar û kurteçirokan ji farisî wergerîne ser zimanê kurdî.

(Ji bo Apo Yaşar Kemal û gulbarê Çiyayê Agirî)

Le henar dûtir in

Gulbehar

Be sebetê dildariyewe

Nemeyekî bo Agirî nûsi

Ewiş razekey

Le nêw pemey dilida haşarda

Çawerêy teqînewey

Katî dilî kird

Min pîr le hetawî Newroz dekemewe

Piştûwên reşî estêre sûr

Le henderanî minewe wergerê

Qijim be bay wewewş siparduwe

Zewîn pele dedat

Eey serhêdan

Heta henderanî min û to

Çen werze henar mawe?

ÇEND KURTE ŞÎR

Çawim maçî

Hemû kêwekanî

Dunya deka

Boye yaxîm

Ziryay giyan

Lew rojewe wa berday

Kotiranî eîsq

Balit girtuwe

Şeîrekanim egrîn

AMADEKAR: EHMED ŞERÎFÎ

● 21.02.1998.Şemf:

Konsera Denbêj Zahiro. Saet: 14.00
Yekitiya Malbatên Mezopotamya. "Çend mînak ji xwarinên kurdî."
Saet: 15.00

● 22.02.1998.Yekşem: Teatra Jiyana Nû. "Komara dînan Şermola" Saet: 14.00

Bernameya Şevên Toreyî-Jiyana Rewşen. Saet: 18.00

● 25.02.1998.Çarşem: Gotûbêj: Di şanoyê de afirandin. Listikvan-derhêner Mahir Gûnşiray. Saet: 18.00

ÇALAKIYÊN HEFTEYÎ



Li MEDKOM'ê

● 21.02.1998.Şemf:

Guhdarî- "Keskesor." Saet: 17.00

● 22.02.1998.Yekşem:

Bîranîna Cigerxwîn û guhdariya helbestên wî. Saet: 15.00

Li NÇM'ya Îzmirê

● 21.02.1998.Şemf: Koma Dengê Biratî "Narîne" Saet: 14.00

● 27.02.1998.În: Konferans-"Di dîrokê de çapemeniya kurdî"

Beşdar: Koray Düzgören.

Maka rojnameyên bi kurdî yên heyama serhildanan:

Welat

SAMI BERBANG

Di destpêka salên 1990'î de li bakurê Kurdistanê, agirê ku li ser çiyayan pê ketibû, êdî tîna xwe dida bajar û navçeyan, li wan deran jî serhildanên gelêrî dest pê dikir. Her şoreş divê di warê rewşenbîrî de jî berhemên xwe bide, ji bo di vî warî de pêşketineke berbiçav pêk were jî sazî û weşan pêwîst in. Ev rastî jî hêla birek rewşenbîrên welatparêz ve jî dihat zanîn. Bi vî bîr û baweriyê saziyên çandî-yên mîna NÇM û Înstîtuya Kurdî hatin avakirin, pişt re jî weşanên mîna kovara Rewşen û rojnameya Azadiya Welat dest bi weşanê kir.

weşanê nekir, jixwe derfetên vî yekê nîn bûn, lê agirê ku li welêt gur bûbû, tîna xwe dabû di lî kurdên ku serbajarê bîzansî û osmaniyan dijîn jî. Her wiha vî agirî hêvî û evîna ji bo welat zêdetir kiribû, lewre jî navê Welat li rojnameyê hatibû kirin. Berpirsiyarê Giştî yê Rojnameyê Abdullah Keşkin bi van gotinan vî rastiyê tîne derdibe: "Îro li her aliyê welat, tovê jiyaneke nuh tê çandin. Kulîlkên serhildanê roj bi roj geş dibin û qam didin. Bi van kulîlkan, kulîlkên xwînê, welat geş dibe: Kesk dibe, sor dibe, zer dibe."

Di ser derketina Welat re 6 sal derbas dibin. Welat bi hêviyê mezî dest bi we-

welat

Rojnameya Welat ku 115 hejmar hate weşandin û zêdetirî du salan weşana xwe domand, di 22'yê reşemîya 1992'yan dest bi weşana xwe kir. Di hejmara yekemîn a Welat de, Apê Mûsa sedema derketina rojnameyê wiha rave dikir: "Çima em derdikevin? Adet e, wextê ku rojnameyek derdikeve dibêjin, "çima em derdikevin?" Îca ji bo Welat gerek em bêjin çima emê derdikevin?" Xwediyê rojnameyê Zübeyir Aydar jî bi van gotinan pêwîstiya rojnameyê bi vî rengî tîne zimên: "Îro li ser gelê Kurd bijavtinek pir dijwar tê meşandin, ew bijavtin bi piranî li ser zimanê kurdî ye, rawestandina bijavtinê, têkoşîna li hember vî kotekiyê û xurtiyê, bi xwedî derketina zimên tê meşandin. Bi vî awahî perik ji vî bijavtinê tê şikandin. Bi vî rengî qeyd û zincîrên li ser zimên ten perçekirin."


Rojnameya Welat li ser axa welêt dest bi

şanê kir, bîngehek jî amade kir, li ser koka Welat, rojnameya Welatê Me aj da, niha jî Azadiya Welat bûye warê wan hêviyan. Çi bûn ew hêvî? Ev gotinên Zübeyir Aydar van hêviyan xweş tînin zimên: "Rojnameya Welat, ji bonî serfiraziya zimanê Kurdî gavek pir mezî e, em dizanin Rojnameya Welat, di vî navçê de gavek dereng e. Lê belê gavek xwîrt û dîrokî ye." Ev hêvî û dilgeşî di van ristên Abdurahman Dure de jî baş diyar in: "Azadî pir bi naz e, bûka gelen ku xwîn e/ Welat ewî dixwazê, cehd û xebat werîne"

Lê me nekarî hemû hêviyên Apê Mûsa pêk bînin, lewre wî digot: "Tirka di salekê dehîni alfêba Latîni bûn. Ma hun wek wan jî nayên. Ê ger di deh rojan da hun hîni alfêba xwe bibin û jî vî pêve jî, hun name û nivîsên xwe bi kurdî binivîsin û bixwînin." Em mirovên ji kêr-xwendî li wir bihêlin, gelek kurdên ku navê rewşenbîriyê li xwe dikin, ev hêvî û dax-

TÎŞK

Dîroka xo ebi xo binivîsim



LERZAN JANDÎL

Seke êno zanayene dîroka ma zê dîroka şaranê bînanê bindestan, ya hetê ma ra tam û raşt niyama nivîsnayena ya hetê kesane xerîban ra kêr û qels ama nivîsnayene, yan jî hetê koledaran ra bîngê zuran û înkârî ser ro şaş û çewt ama nivîsnayene.

Koledaran ebi sedseran, ma ebi nameyê baweriyên, dînan, ebi nameyê biratiyê xapitîme. Seranê peyanan de jî dest kerd ci, zîwanê (zonê) ma, dîroka ma, nameyê ma, ebi kilmiye ma înkâr kerdîme. Yanî ma nêşîkînimê dîroka xo koledaran ra bîmusîme. Çimke şeba înan (dînan) ma çînimê.

Kesê xerîbê ke dîroka ma nivîsna yan jî dîroka ma ser ro nivîsno, zaf kêmasî kerdê. Zanayena nînan qels biya. Zafêriyê xo mîsyonerê dewletan, mîsyonerê rêwî, leşker û konsolos û ê bîni biyê. Nînan jî rêy çiyê nivîsno/vato, rêya bîne çiyê de bîn nivîsno/vato. Vaten û nivîsnayenê zaf kesane yewbînan nêgênê (nêcênê). Bêguman na nîna a manayê ke no kedo ke nê mordemekan dayo dîroka ma, no karê înan bêqedr o. Ma, ma qeyî nêşîkiyayîme dîroka xo binivîsnîme? Cewabê na pîrse ebi bawerîya mi no wo: Sebata ke şarê ma dîroka de wayîrê otorîteyêde organizekerde, ma vacîme dewlete yan jî formê dewlete yê bîni zê federasyonî, nêbiyo, derbazê nivîsnayena qanûnan, fermana, emran, arêdayêna qançûran (vergiyan) û leşkeran nêbiyo, ma nêşîkiyayîme dîroka xo ebi xo binivîsnîme. No jî êno a mana ke derheqê dîroka ma de dokumentê nivîskî gelê kêrî yê, hama-hama qe çîne. Sîndorê nê çiyane ke estê jî hundnê (handê) zanayena nivîskarî yê, lokal ê. Nê pêrotiya welatî nêcêne re çîman ver. Naca bîngeqesaya "Welatî" tim teng û qij ama diyene. Angorê bîrûbawarî û armancanê nivîskarî ama nivîsnayene. Nînan ra ma şîkînimê nameyê "Şerefname" yî bidêrimê. "Şerefname" de nivîskarî qasê zanitena xo zanayenê derûdorê xo ebi kronolojî nivîsnê. Nê dokumentî de çiyê ebi qedrî estê. La belê nû çî seba zelalkerdena dîroka ma, analîzkerdena aye (daye) re, ci ra dersguretene re, nêvecenê.

Pêyniya sedsera 19'îne de tenê roşnîvanê ma ebi vetena rojnameyan, kovaran û pirtûkan dest eşt nivîsnayena dîroka ma. Komele û cematê kê, nê serande amê awankerene seba zanayena dîroka ma çiyê bîngeyî ardî meydan û kerdî.

Sedsera 20'îne de ha roşnîvîrê kurdî ha roşnîvîrê xerîbî bibê, dîroka ma ser ro karê zaf bîqedrî kerdê, berhemê zaf xurtî dayî. Ebi kar û kedê nînan zanayena ma tayîna biye zixmtêre, xurtêre, hîra û xorîtêre. Hama wuncuya jî kêmasî estê û nê kêmasî huna jî benê û ê wê bibê. Naye de anormaliyê çîna. Ma jî zê zanayan û roşnîvanê zaf şaran nê demî ra derbaz benîme. Sebata ke meselaya ma naca na niya, ez nê çîyan ser ro nêvindena. Meselaya ma, dozkerden, raştînivîsnayen, analîzkerden û her çî ra ver jî nivîsnayena dîroka ma wa. Sebata ke înstîtutiyonêde ma wo sentral (merkezî) çîno, ganî nivîsnayena dîroka ma hetê kesane ma ra bêro kerdene. Eke niya bî jî, bêguman kêmasî, xeletî te de benê. Û her çî ra ver jî nivîsnayena dîroka de ebi nê metodî bawerîya yewheta subjektîve zaf ca gena. Sebata ke ma nê şaşetîya mekerimê, ganî ma metodanê îlimî xo rê bînge bigîrimê. Nivîsnayena dîroka ma de ganî prensîbê ma, metodê ma, analîzê ma bîngeyê îlimî ser ro awan bê. La belê kaleka nê metodanê îlimîyan de ganî ma her het ra azad bîme. Bê azadiye ma nêşîkînimê ebi metodanê îlimî dîroka xo zelal bikerîme.



Sermaya Mirinê

Saliho yekî çil salî bû. Peyayê rîya tarî bû. Dikandarekî kevn bû. Zimanekî dirêj li ser bû. Ji gundiyan pir hez dikir! Digote gundiyan: "Hûn çi di bin bibin, dirav ne girîng in, em birayê hev û du ne!" Bihayê tiştan du qat, sê qat li deftara deynan dinivîsî, gundî jî bi wî bawer bûn. Lewre têjîkên mar bêjar nedibûn... Yekî guh fireh bû. Wî tiştêk ji bîra ve kiribû, êdî ên ku ew baş nas dikirin jî hebûn.

Sibehekê rabû, ku here dikanê veke; sûk serê jêr de vala bû, darebe hatibûn danîn. Teng zivirî. Liqayî xîko hat. bi xweşgotinan dest pê kir!

— Yezdan kêmaniya yên wekî te ne-de. Ku her mirov wekî te mêrxas bûya, min dizanibû wê çawa çêbûya.

Xîko: "Nêçira kewan di dawîya zivistanê, di şilbaranê de xweş e. Ne welê ye Saliho? Tu bi vê gotinê baş dizanî?"

Saliho wekî cêrekê ava sar di serî de birjînin bédeng ma, dev li wî ziwa bû, miçiqî... tirsîya. Di ber xwe de got: "Ma serbaz jî ji wan e? Vî terorîstê hanê çawa gotinên min bihistine?" Bi kenekî zor gotê Xîko: "Ka were em biçin xwarinê bixwin Xîko!"

Xîko: "Oxir be oxir be..."

Tariyê erd girt. Saliho bi bez çû. Tiliya xwe ya qelîcanê li dergeh da. Rêhevalê wî derî vekir û got: "Ulan pûşt, seni özlemiştim. Ama zamansız geldin. Bir saat sonra Görüşürüz. Değerli bir hemşerim içerde. Yavru keklik! (Kuro tolazo! Min bêriya te kiribû, lê tu bêx-

wext hat, em dê saeteke din hev û dû bibinin. Li hundir zeriyeke heye!)"

Rewşa Saliho ne baş bû. Di ber xwe de diaxivî: "Di ola me de jî tê gotin ku ji kuştinê re kuştin, ji bo qisasê her tişt li rê ye! Ez dê bi awayekî wisa bi Xîko vedim wê feleka xwe şaş bike... Ma ew îro li vê deverê li çi kula bavê xwe digeriya? Yarebî, tu min bide ber xatirê kalikên min yên ewliya! Ma Xîko bavê xwe bi ên wekî xwe da darizandin... Xîko, dê ez îşev nêçira kewan rê (ray) te bidim!"

Wî û serbaz hev û du dîtîn. Gels û planên xwe saz kirin. Saliho der barê Xîko de pir vedirîşiya. Wê armanca wan ya herî mezin keçika Xîko bûya.

Rewşê wê rojê pir bi kêf bû. Kefî xemilandibû. Gava ku tişt çêdikirin carinan dayika wê xwe bi hêrs dixist: "Keçê, ronahî di çavên te de nema, bes e..."

— Dayê ez bi gorî, tu nizanî bê ka alikariya vî şixulî çiqas tiştêkî xweş e, ez dixwizim bi şev û roj kar bikim.

Xîko: "Mirovekî Saliho, gelekî tîfîng li derdorê bi erzanî firotine, dawî tev dane dest."

Bêhna Rewşê teng bû. Rabû çû kullî-nê. Di legana nan de, du heb nanên ketî mabûn. Nan da ser çavên xwe û got: "Tu ji evîn î, dirok di bêhna û hilma te de ye jî."

Bû teqîn û nalîn. Awayê avêtina ser malan guheribû; pêşî avahî gulebaran dikirin, hêj êrîş dikirin.

Rewşê kêr û dermanê dayika xwe avêt paşila xwe. Ketin hundir. Ciwanîya Rewşê şewl dida. Serbaz çixarê pêxist. Di ser leşkerekî de zivirî û çav

avête wî. Leşker wekî tajiye nêçirê, hî-nî peywira xwe bûbû.

Çiqas cilên ku bi destan hatibûn çêkirin hebûn, agir bereda wan. Tu kes di hundir de nema. Saliho di hundirê panzêre de diranên xwe diqiriçandin (sîqirand) wekî seyê bigicire mirovan.

Diya Rewşê paş de zivirî hestiyê serê ga û paçikên rengîn ji ser deriyê Xanî hildan. Serbaz bi ken û metel mayî: "Hayret evi yanîyor, o bir kemik parçası ve bir kaç bez parçasını kurtarmaya çalışıyor. (Tiştêkî ecêb e! Xaniyê wê dişewite ew li dû xelaskirina hestî û çend parçe paçikan e.)

Diya Rewşê xwe ranegirt: "Çerqa me jî ev e; hûn xera dikin em ava dikin. We mal şewitand, lê em dikarin bi wan paçikan jî şa bibin."

Rewşê girtin û derketin derveyî gund. Rewşê êdî bi axiriya xwe dizanibû. Biryara berxwedanê da.

Saliho û serbaz daxwaziyên xwe ji Rewşê re gotin: "Were meke, cihê wan ji me re bibêje. Em dê pir diravan bistînin. Pariya te jî tê de ye. Ku tu bédeng bimîni binihêre em bi qasî sedan hene!"

Rewşê bersiv da: "Netirsin! Hûn dê heqê seriyan bistînin. Dibe ku hindik be, lê hûn distînin...! De werin ez we bibime parêzgeha wan!"

Saliho jî kêfan tewrên gêjekî nîşan didan. Bi silekî: "De bangî wan bike!" Rewşê pekandî ser Saliho: "Ew ne (...) bavê te ne, tolazê zexel, bêxîret. Jixwe serê me yê mezin bi kûçikên wekî te re ye."

Saliho jê hebû ku, li Rewşê bide.

Rewşê, li ser devê zinar qiriya: "Berivanê guldaneke rengîn bû ez jî kullîk..." Çawa xwe avêt, bû wesle wesle. Xwîna wê şimşirik da girîvandin.

Koma xwînmijan dageriyan. Saliho ziman xwe dialêst. Qirik lê ziwa bûbû, wekî pişo çilmisî bû. Her tişt li ber çavên wî tarî bûbû, tepîna dilê wî bû. Dil li serbaz jî xişoşe bû. Miraz û hêviya wan, ew bû ku xwe bigihînin navçeyê. Bi şik li çavên hev û du dinihêrîn. Ji aliyekî ve jî hêviya wan a pere standinê çixlî dikir. Saliho: "Em ji niha de dest bi raporê bikin."

Rê li wan dût dibû. Destpêka bahoze li wan bû xezeb. Bû şevtarî. Serma ya mirinê li wan bandor dikir. Teqîneke mezin ji panzêra pêşî hat. Serbaz damençe derxist, tifi çavên Saliho kir:

— Ne ji te bûya ez nedihatim, ne jî dikaribûm bêm. Hûn giş wekî hev in. Ez hîç pereyan bi te didîme xwarin..!

Laşê Saliho avêtin nav deviyekê.

Serbaz êvarî raporek amade kir: "Kar, fırtına dinlemiyen güvenlik güçlerimiz yaptıği operasyonda Rewşen ve Saliho adli iki teroristi bir sığımkta ölü ele geçirdi." (Hêzên me yên ewlekariyê li ber berf û bahoze di operasyoneke de, di parêzgehekê de du heb terorîstên bi navê Rewşen û Saliho kuştin.)

Di çirokê kurdan ên gelêrî de her tim gul û strî hene. Ji xwe jiyana jî ev e... Dirokê carekê din rûpela xwe vekiribû.

CİHAN ROJ

Divê rengê Jiyana Rewşen neguhere

Hejmara 16'an ya Jiyana Rewşen derket. Di vê hejmarê de digel nivîsên çand û hunerî, çend nivîsên lêkolînî jî cih girtine. Ev hejmara Jiyana Rewşen bi sergotarekê dest pê dike. Di vê sergotarê de bi agahiyên balkêş çêlî Gurê Manco tê kirin. Tê daxuyandin ku Gurê Manco ku di jiyana kurdan de hêmayeke tirsnak e, îro li nav civakê digere. Gurê Manco îro bûne kontra û xwîna kurdan dirijînin.


Piştî vê sergotarê, nivîsa Feqî Husyn Sağnîç tê. Ew di vê hejmarê kovarê li ser Melayê Bateyî rawestiyaye. Penda li ser Melayê Bateyî bi ravekirina peyva mela dest pê dike. Ev ravekirin di nivîsê de cihekî berfireh digire. Nivîs bi hinek agahiyên li ser jînenîgariya Melayê Bateyî didome û bi çend helbestên wî dawî li nivîsê tê.

Ji bilî van nivîsan di vê hejmarê de gelek çîrokên kurt hene, hinek ji wan jî zimanên biyan hatine wergerandin. Çîroka Ernest Hemingway ku Kawa Nemir bi sernavê "Li Îzmîrê li ser lengergehê" li kurdî wergerandiye mînak e ji bo vê yekê. Her wiha nivîsên bi zaravayên soranî û kirdkî jî di kovarê de her diçe zêdetir dibin. Di vê hejmarê Jiyana Rewşen de çîrokeke gelêrî ya bi kirdkî cih girtiye. Navê vê çîrokê "Dik Silêman" e, çîrok bi şeweyekî baş bi îro ve hatiye girêdan.

Her wekî me di serî de dabû xuyakirin, di vê hejmarê kovarê de çend nivîsên lêkolînî jî cih girtine. Nivîsa Yaqup

Başboğa ya li ser Îsaac Newton nivîseke bi vî rengî ye. Di vê nivîsê de li ser jînenîgariya Newton û xebatên wî yên zanistî tê rawestîn. Dîsa nivîsa Abbas Îsmail a bi navê "Manî kî bû" jî li ser jiyana avakarê ola manî û taybetiyên vê olê ye. Mînaekeke din a nivîsên lêkolînî nivîsa bi navê "Asûr: paşeroj û destpêk (beriya dîrokê)" ye. Ev nivîs jî ji hêla Nejad Ayaz ve ji îngilîzî hatiye berhevkerin.

Ev hejmara Jiyana Rewşen ji aliyê çîrokên zargotînî ve gelekî dewlemend e. Ji bilî çîroka bi kirdkî ku me berê qala wê kir, çîroka bi navê "Evîna Enîs û Şeng" ku ji hêla Raman Çakar ve ji herêma Xerzan hatiye berhevkerin û çîroka



vê mirov pêşî qala çîroka Hamdullah Baki bike, ew çîrok ji aliyê naverokê ve jî, ji hêla hûnandinê ve jî dên û bala mirov dikişîne. Lê divê bê gotin ku hinekî bandora çîrokên Helîm Yûsiv li ser çîroknivîsê navborî çêbûye. Dîsa çîroka bi navê "Qopo" ku ji hêla Kazım Ekinci ve hatiye nivîsandin, di çêj û ekla metelokeke gelêrî de ye. Li gorî nîşeya ku li

Mihemed û Fatima Salh Axa ku ji hêla Abbas Alkan ve hatiye berhevkerin, mirov dikare wekî mînak bide. Di çîroka bi navê "Evîna Enîs û Şeng" de digel hêmanên hevpar ên çîrokên gelêrî, hinek hêmanên nû jî cih girtine.

Divê bê gotin ku digel van nivîsên gelêrî û nivîsên wergerandî, nivîsên ku bi kurdî hatine nivîsandin jî balê dikişînin. Di vî warî de di-

bin çîrokê hatiye nivîsîn, ew çîrok bi destê Teatra Jiyana Nû dibe listik.

Di kovarê de helbest cihekî berfireh digirin. Mirov dikare bibêje ku hemû helbestên ku di nav rûpelên kovarê de cih girtin, bi awayekî serbest hatine nivîsîn. Di vê hejmarê kovarê de helbesta yekemîn ku li pişt berga pêşîn cih girtiye, ji aliyê Seroka NÇM'ê Nuray Şenê ve hatiye nivîsîn. Ew helbest li ser gerîla Egî e. Li nik helbestê wêneyekî wî yê rengîn jî cih girtiye. Kawa Nemir di bin sernavê "Ta -2-" de helbestek ristiye, wî di dewsa beşan de, ji ber ku xwestiye rengê şanoyê bide helbestê, perde nivîsiye.

Dîsa xebatkarê kovarê A. Rahman Çelik di helbesta xwe ya bi navê "Kurmekî tîrnexwir e dîrketin" de li ser evîn û hesretê rawestiyaye. Her wiha Îbrahîl Seydo Aydoğan di bin navê dîrî, helbestên min, bîrîkirin, ma, evîn, hesret de li ser mijarên cur bi cur çend malik û çarînen xwe rêz kirine. Cemil Denli ku yek ji xebatkarên kovarê ye jî di vê hejmarê kovarê de helbesteke dirêj darjitiye. Ji bilî wan kesan, kesên mîna Hoza-nê Dilzar, Rênas Jiyana, Hecî Qadirê Pa-sûrî, Nesim Kasirga di hejmarê 16'an a kovara Jiyana Rewşen de cihê xwe girtine. Di vê hejmarê de hevpeyvînek digel wênesaz Fewzi Bilge jî heye.

Di kovarê de cih girtina nivîsên lêkolînî rengê kovarê guhartiye, ew jî dirûvê kovareke çand û hunerî derxistiye.

SERWÎSA ÇANDÊ

Mûcîzeyaya mezin

MEDENÎ FERHO



Serdarê mezin Gandî, lepikên spî xistin destên xwe û dest bi polîtîka berxwedaniyê kir. Heya roja hate kuştin jî, lepikên spî jî destên xwe demexistin. Gandî, Machiawelli li derewê qeliband. Machiawelli digot: "Polîtîka bi lepikên spî nayê kirin." Ramanê Machiawelli, ku dîrokçêker pîr delal û xweş nas dikirin, di sedsala bîstan de çewt derket.

Gandî her çiqaşî di xîşka çarenûsiyê de coganê xwe hejandibe jî, ne mîna Mûsa bû, ku hawara xwe digihande xwedayê xwe. Mucîzeyaya Gandî di raman û gavên berxwedanê de bûn. Aya, hinek mirov hene ku dikarin bibêjin Gandî çarenûsî bû. Ne dîrî rastiye ye... Gandî di nava kincên şalikî de, paqloqên hişkî bê goşt li derve û bi wê beşûşîya tîr ronahî berxwedaneke mezin daye. Dawî piştî împaratoriya ku roj li ser nediçû ava li erdê da. Tacîdariya berxwedana sedsala bîstan bi navê Gandî tê

xwendin.

Dergehên sedsala bîstûyekê li ser piştê hatine yekirin. Belam heye ku cokên xwînê bigihînin kûrahiya vê sedsalê jî, lê, wilo xuya dike ku çarenûsiya sedsala bîstûyekê bi destên kurdan tê nivîsandin. Mohra cîhanşûmul ya kurdan li vê sedsalê dikeve. Tacîdarên kurd bi hiş û hewnên serxwest balê bidin paşerojan, mucîzeyaya mezin derdikeve holê. Bêguman di nava xaq û rîpên dijmin de listika roleke wilo ne hêsa ye. Lê tacîdarên kurd di dawîya sedsala bîstan de, tîba û tîrsa mezin şikand.

Hêrs degelî, kîna jîndarî ye... Her sê xislet navê serkeftinê ne...

Li hemberî gelê kurd, xwedî mîrata împaratoriya Osmaniyan, tirkên ku ferman-darên wan bi giştî ji qîjlên Yenîçeriyân derketine, hene. Li gorî ramanê tirkên, pêwîst e ku komên xelkê bindest bin û bê xanedan û malbatên mezin bin. Ku di nava vê daxwazê de bê rêxistin û bê parastinî be. Ev hişmendîya han, di dawîya împaratoriya Osmaniyan dest pê dike û piştî damezrandîna komara Tirkiyeyê bi xurtî û di nava zanistiya aborî de hate bikaranîn.

Li gorî pêvajoya dîrokê, ger maqultîya Arîsto neyê şikandin û aramiya xiyane-tê neyê hilweşandin, cîhaneke nû nayê avakirin. Lewre dijminên herî dijwar ên gelê kurd ew çînen xwe ne nas in, ku her dem di nava xiyane-tê û kurtîlkujiyê de dib-

ine mirtala dijmin û di serdilkê kurdan de dibin xencera janê.

Ne dijminê gelê kurd Îngilistan e, ne gelê kurd dikare bi serdarekî mîna Gandî bi ser bikeve. Lewre, mirovê ku tacîdariya gelê kurd bike, nikare lepikên spî bike destên xwe. Ji ber vê çendê mafê kesî nîn e ku li hemberî Abdullah Öcalan ve baweriyê bike mortal û rexne bike. Tacîdariya Abdullah Öcalan li gorî hoy û mercên rojane, rêça Machiawelli ye. Wî ferman-dar û rayedarên tirkên xweş nas kirine. Abdullah Öcalan xweş tê gihîştîye ku ferman-dar û rayedarên tirk sudeke mezin ji zîlm û zordariyê girtine. Dema dibêje: "Dijiminê gelê kurd yê herî mezin xwînmijên tirkên in, ve rastiye tîne zimên. Gandî dema gel da dî xwe û berê xwe da danheva xwe, bêçek û berxwedan bû. Leşkerê Îngilîzîyan miştaxe ji Hindistaniyan çêkirin. Di sala 1926'an de, piştî serhildana Bagokê gelê kurd tîk çû, di navbera Mêrdîn û Amedê de, di Newala kûr de ji termên kurdan çiya hatibûn çêkirin.

Ew çiyayên ji termên mirovan bi giştî ne çekdar bûn. Pêwîst e ku tacîdar dîrokê xweş bizanibe. Lewra dema hêzên kurdan ku di bin tacîdariya Abdullah Öcalan de, berê xwe da Mezra Botan xwe di nava çek û rex-tan de pêçan.

Mîna me li jor got: Her dem bi guhartina cîhanê re, pêwîst e ku wekhevî û hêza hundirîn bête raçavkirin.



Bê Clintonê şilamûndîsist keso şer nêwazeno

Ek sebeb kîmyewiyê dewletanê bînan de jî estê. Ek şarî rê zilm û îşkence kerdino, dewleta Îsraila şarê Filîştin û Lubnan rê, dewleta Tirkîya wa jî, şarê kurd rê zilm û îşkence kena. Çi ra Tirkîya û Îsrail yan jî dewletê bînî nê, çi ra Iraq rê vardayin?."

Hîrê çehar hefte yê her keso, krîzo ke mabenê Amerîka û Iraq de vejîya-wo, ey sero qîsey keno. Amerîka wa vana: "Iraq dest de tîfingê kîmyewî estê", Iraqa jî qebûl nêkena. Çend hefte yê ro-jewê dinyay no yo. Amerîka qandê vardayinê eskerî viraştin heme çiyê xo kerdo hedre û awa nika pawena zey 1991 dewletê bînî fina destegê xo bidê Amerîka.

La belê ewro dewletê bîne, zey 1991 destegê xo nêdane Amerîka. Bê çend dewletan, ê bînê pêro vera vardayinê eskerî vejyenê û wazenê ke krîzê mabenê Amerîka û Iraq wa raya dîplomatika bêro çareserkerdin. Hetê bîn ra, dewletê ke ma bi name kerd, bal an-cenê ser raştîyêde bîn û vanê: "Îsrail dest de jî çekê kîmyewî estê, la belê Amerîka qandê ey çî nêvana. No diriyîn o."

Ewro dewletê bînê destegê xo nedanê Amerîka. Dewletan jî viradim şarê Amerîka wo jî desteg nêdano ci û nêwazeno Iraq rê vardiyin virazyo. Amerîka qandê destegê dewletanê bînan girotin wezîra karê teverî rişt dewletanê Rojhilatê Miyan. La belê ê dewletan vînayinê xo nêvurnay û vatenê xo yê verîn ardî zîwan. Amerîka ancî vînayinê xo nêvurnay û vat: "Ek Iraq teslîm mebo, mayê Iraq rê vardayin virazim."

Na fin şarê Amerîka vengê aşti kerd vêşî û vat: "Mayê şer nêwazem. Vengê şarê Amerîka ser, na fin wezîra karê teverê Amerîka çend wezîranê bînan piya jû eywana gird de, vejyê şarî ver û înan kombiyayin viraşt. Wezîra Amerîka wast ke şarê xo qandê vardayinî ikna kiro. No kombiyayin televîzyonê CNN de mûsya (gösterildi).

Kombiyayin de wezîra karê teverê Amerîka Madlein Albright vînayinê xo ardî zi-

wan. Hemû vînayinanê Madlein Albright ra boya şerî û gunî ameyê. Wezîra karê teverê Amerîka, kombiyayin de wina vat: "Iraq dest de tîfingê kîmyewî estê, gerek nê tîfingî werte ra hewadiyê, ek nê tîfingî mehawadiyê qandê şaranê dinyay (taybetî qandê şaranê Rojhilatê Miyanî) qe rind niyo û tehdîdo girdo. Zey zanayina şima Saddam Hüseyin diktator o. Ek ma tîfingê ke Saddamî dest de înan îmha mekim, Saddam ê tîfingane kîmyewiyana şaranê Rojhilatê Miyanî rê vardayin virazeno. Coka gerek Iraq rê vardayino eskerî virazyo û tîfingê kîmyewiyê ke Iraq dest de werte ra hewadiyê."

Mayê şer nêwazem

Şaro ke bibi tewr dê kombiyayinî hema hema pêrinê înan vatanê wezîra karê teverî sloganan û çepikana protesto kerd û giranî wina vat: "Mayê nêwazem şer vejyo. Tîfingê kîmyewî jew Iraq dest de nê, hema hema hemû dewletan dest de (taybetî jî dewleta Îsrail û Tirkîya de) estê. Ek sebeb tîfingê kîmyewiyê çi ra dewletanê bînan rê vardayino nêvirazyeno? Ek şarî rê zilm û îşkence kerdin o, dewleta Îsraila şarê Filistin û Lübnan rê, dewleta Tirkîya wa jî, şarê kurd rê zilm û îşkence kena. Çi ra Tirkîya û Îsrail yan jî dewletê bînî nê, çira Iraq rê vardayin?."

Rastî wezîra Amerîka nê pirsanê şarî ser, xolkê ci bi teng û hêrsa wina vat: "Saddamî sera 1988 de Sûka Helepçe de nêzdiyê 10 hezarî kurdî tîfinganê kîmyewiyana kiştî, xeylî jî kerdî dirbetinî û seqetî. Ancî Saddamî 1991 de Kuweyt rê vardayin viraşt. Oyo ewro jî qandê vardayin viraştin Tîfingê kîmyewî virazeno û xo kena hedre. Ek ma ewro



nê tîfingan îmha mekim. Saddam ê tîfingana ewro meşt cîrananê xo rê fina vardayin virazeno. Coka ewro Saddamî vardayino eskerî kerdo haq. Ek Saddam wistenanê ma qabûl mekiro mayê vardayin virazim."

Nê hemû vatenan û vînayinanê wezîra karê teverê Amerîka ra oyo winî ayseno ke, sebeb tîfingê kîmyewî niyê, Serokê Amerîka Şilamûndîsisto (doxînsist/ uçkuru düşük) dewletanê Rojhilatê Miyanî zey keynekanê amerîka vînenê û wazeno înan pêrin bigiro binê bandora xo. Hetê bîn ra jî Amerîka wazena petrolê herêm bigiro binê bandora xo û ê petrolî xo ra bigurîno.

MEMED DREWŞ

WELAT

Rojnameya Hefteyî
(Haftalık Gazete)

Li ser navê
Zerya Basın ve
Yayıncılık
San. Tic. Ltd. Şti.
(adına)
Xwedî (Sahibi)
CELALETTİN
YÖYLER

NAVNÎŞAN
Ayhan Işık Sk. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL
TEL-FAX:
(0 212) 251 90 13

Gerînendeyê Weşanê
(Yayın Yönetmeni)
SAMİ TAN

Berpîrsê Karên Nivîsaran
(Yazı İşleri Müdürü)
M. SALİH TAŞKESEN

ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık
A.Ş.

BELAVKIRIN
BİRYAY Dağıtım
NÜNERİTİYÊN ME
(Temsilciliklerimiz)

Munchen:
(Nünerê Giştî yê
Ewropayê)

Mahmut Gergerli
49 871 67 08 15

Brüksel:
Medenî Ferho
32 532 721 12 03

Suriye:
Jana Seyda
Helim Yüsviv

Berlin:
Silêman Sîdo
00 49 30 691 6495

Hannover:
Selim Biçük
49 572 18 13 60

Bonn:
Ahmet Baraçıklıç
49 228 66 17 40

Hollanda:
S. A. Fewzî
31 04 85 55 43

ÛLKEDE

Ji Gündemê

Nirxandina hefteyê

Pest û kotekiyên ku ev demê li ser HADEP ê tene meşandin, piştî girtina Serokê Giştî Murat Bozlak gihiştê radeya xwe ya herî bilind. Li pey qewmîn û pêkanînan ku bi fermana MGK ê çêbûne baş diyar bû ku li Tirkîyeyê kî desthilatdar e. Mesut Yılmazê ku gotibû "Dê sala 1998'an bibe sala demokrasî û mafên mirovan". Piştî van rûdanan xuya bû, divê gel çiqas bawerîya xwe bi siyaseta Mesut Yılmaz bîne.

GOTINA DAWÎ WÊ GEL BIBÊJE

Zordariyên li ser HADEP'ê, nêzîktêdayina dewletê a li hemberî kurdan, ku piştî hîlbijartina giştî, ger ne ji sistema bendavê bûya wê iro di meclîsê de bûna, jî baş dide xuyakirin. Ev helwest iro jî ne guheriye. MGK'ê ya ku piştî derbeya 28'ê reşemiyê pêvajoyekê nû dabû destpêkirin û di vê pêvajoyê de ji bo ku tevgera îslamî ya siyasî kedi bike partiya Refahê girtibû, demê dirêj xwast ku HADEP a ku parêzkarê demokrasî û yekîtiya kurdan e, teslîm bigire. Ji ber ku piştî komployên dûvedirêj, dewlet li hember HADEP'ê bi ser neket.

Niha bi hinceta derketina qeyrana kendavê zordarî û pestên xwe li ser HADEP'ê zêde kir. Dewleta tirk ji ber portreya kurdan ku piştî qeyrana kendavê derketiye holê ketiye nav tirs û sawekê mezin. Lewre jî ji bo ku rê li ber pêşveçûn û rola kurdan a di şerê kendavê de bigire, pêşî êrîş bir ser kurdên ku di nav sînoren xwe de ne. Avahiyên HADEP'ê ji bo salnameyekê ku 2 meh berê hatibû çapkirin, bi awayekî tirajî-kornîk hatin dagirkirin, rayedarên partiyê hatin binçavkirin, piştê jî hatin girtin.

Dewlet bi van kiryarên xwe, di serî de dixwaze gelê kurd, kesên şoreşger, demokrat û welatparêz bitirsîne. Lê dirokê de hatiye selmandin ku, gotina dawî her dem gelan gotiye. Gelê kurd ku li Amedê, Stenbolê, Enqereyê, Edene, Bursa, Mersînê û li gelek bajarên din derketibû kolan û qadan û sloganên wekî "HADEP gel e" qirandin û bi vê yekê jî xwedîti li partiya xwe kiribûn.

Gel dide xuyakirin ku hêj gotina dawî negotiye. Divê di demeke zûtirîn de, tevahiya şoreşger, demokrat, welatparêz, sendîka, rêxistinên girseyî, partiyên siyasî û yên ku îdîa dikin ew li cem gel in, divê guh bidin qirîn û banga gel û divê li dijî êrîşên dewletê eniyekê berxwedanê ava bikin.

16 reşemî 1998 dîşem:

BI ZORA TEHDÎDAN NÎNOVAYÎ KOÇBÛN

Piştî ku rayedarên Neteweyên Yekbûyî ji Kampa Ninovayê vekîşyan, penaberên kampê ji ber nebûna ewlekariya xwe, ji kampê koç dikin. Piştî Qeyrana Kendavê ku ji layê Amerikayê ve hate derxistin, bû sedem ku artêşa tirk 7 hezar leşkerên xwe ber bi bajarên Musil û Kerkûkê ve bişîne; penaberên kurd ji ber ku ewlekariya wan di xetereyê de ye, bi awayekî giştî konên xwe şewitandin û ber bi Musilê ve çûn. Berdevkê Penaberên Kampa Ninovayê Mehmet Yaşar daxuyand ku wan ji bo ewlekariyê serî li Neteweyên Yekbûyî dane lê tevî ku ev daxwaz nehatiye pejirandin; heman saziyê hêzên xwe yên heyî ji herêmê kişandiye. Li hêla din hate ragihandin ku roja 15'ê reşemiyê penaberên kurd ji layê leşkerên Iraqê ve hatine rawestandin. Her wiha 2 penaber di dema koçberiyê de ji ber şertên dijwar ên zivistanê ji serma qefilîne û mirine.

17 reşemî 1998 sêşem:

HÛN NIKARIN HADEP'Ê BÊDENG BIHÊLIN

HADEP'î piştî muxtîreyê 28'ê reşemiyê 1997'an, bi operasyona Konseya Dewletê ya bo Ewle-



Wêne: Sheri Laizer (Li kampa penaberan dayîkek)

kariya (MGK) hatin girtin. Serokê Giştî yê HADEP'ê Murat Bozlak, Cîgirê Serokê Giştî Mehmet Satan, Sekreterê Giştî Hamit Geylanî, Cîgirê Sekreterê Giştî M. Zeynettî Unay, Jîmar-yarê Giştî İshak Tepe, Endamê MYK'yê Ali Rıza Yurtsever û Endamê PM'ê Melik Aygöl ku 4 roj berê hatibûn binçavkirin hatin girtin.

Di biryara girtina HA-DEP'ê de HADEP'î bi îdiayên "Peywirdarên Taybet ên Rêxistina Cudaxwaz" hatin tawanbar kirin û xala zagona cezayê ya tirk (TCK) a 168/1 ê wekî hincet hate nişandan. Serdozgerê DGM'ê ya Enqereyê Talat Şalk ji bo dagirkirina avahiyên HADEP'ê hebûna salnameyên partiyê wekî sedem destnîşan kiribû. Binçavkirin û girtina rayedarên HADEP'ê di serî de ji hêla HADEP'iyên li Kurdistan û metropolên Tirkîyeyê, ji aliyê rayedar û endamên DEHAP, EMEP û ÖDP'ê bi meş, xwepêşandan û daxuyaniyên çapemeniyê hate protestokirin.

18 reşemî 1998 çarşem:

BOZLAK: "BIRYAR SIYASÎ YE"

Serokê HADEP'ê Murat Bozlak ku bi hincetên salname û perwerdehiya di nav partiyê de tevî 6 hevalên xwe hatibû girtin, ragihand ku girtina wan bi tu defilên rast ve ne girêdahî ye. Der barê perwerdehiyê de jî Bozlak da zanîn ku perwerdehî di nav xebatên her partiyê de heye û tu car ew neketine nav xebatên nehiqûqî. Murat Bozlak şehîdên ku di salnameyê de derbas dibin jî, wekî şehîdên HEP, DEP û HADEP'ê bi nav kirin.

Li hêla din Serokê şaxa HADEP'ê ya Enqereyê Kemal Bülbül, ragihand ku wê serokên HADEP'ê yên bajarên di dawîya hefteyê de li Enqereyê der barê pêşveçûnên dawî de li hev bicivin. Li aliyê din, Cîgirê Serokê Giştî yê HADEP'ê Osman Özçelîk bi daxuyaniyeke



Rêlibergirtin û zordariyên le ser Ûlkede Gündemê didomin

çapemeniyê ku tevî Endamê Meclîsa Partiyê Sedat Yurttaş kiribû de, li ser gotina Serdozgerê DGM'ya Enqereyê Talat Şalk ku gotibû "Dê em îfadeya tevahiya endamên meclîsa partiyê bigirin" de got ku dê ew bi tevahiya endamên meclîsa partiyê re li hev rûnîn û rewşa dawî binirxînin.

Der barê skandala hiqûqî ku li ser HADEP'ê tê meşandin de, Endamê Rêveber ya Baroya Stenbolê Av. Osman Ergin jî wiha got: "Salname berhemekê ku hatiye çapkirin e, çawa dibe ku bi çapkirina salnameyekê Talat Şalk dibêje 'îdare û rêvebirina rêxistina bi çek'..."

19 reşemî 1998 pêncşem:

MEHA RÊBENDANÊ BI PEST Û İHLALAN DERBAS BÛ

Her çend Serokwezîr Mesut Yılmaz sala 1998 an wekî "Sala hiqûqê" û sala "Mafên mirovan" îlan kiribû jî, di rojên derbasbûyî de kifş bû ku ev gotin û hêvî ji rastiyê gelêk dûr in. Ev yek di îhlalên mafên mirovan ku, bi tenê di meha rêbendanê de pêk hatine, gelek baş xuya dibe. Komeleya mafên mirovan di rapora xwe ya meha rêbendanê de daxuyaniyeke ku bi tenê di vê mehê de 7 kes bi awayên fail-î meçhûl hatine kuştin, 4225 kes hatine binçavkirin û 15 weşan an hatine berhevkirin an jî hatine qedexekirin.

Serokê İHD'yê Akın Birdal derbarê îhlalên meha rêbendanê de daxuyaniyek bo çapemeniyê belav kir. Birdal di daxuyaniyê de wiha got: "Di demê ku hîlbijartin di rojevê de ye, binçavkirina serokê HADEP'ê û Murat Bozlak û hevalên wî û di demeke zûtirîn de girtina wan, bi tirs ku wê HADEP'ê zêdetir deng bistîne û di hîlbijartina de wê bi serkeve ve girêdahî ye. Ev nêzîktêdayin helwesta dewletê ya ji bo pirsê kurd destnîşan dike.